

# welat

Sal:2 Hejmar: 66 23-29 Gulan 1993 5000 TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Koma  
Berxwedan  
di Festîwala  
Muzîkê ya  
Navneteweyî  
de

Rûpel 3



*Ji roja îlankirina wê ve, dewletê gelek caran şerrawestin îhlal kiriye...*

## Şer bi vî awayî nasekine

• Şerrawestina ku PKK'ê ilan kiribû, ji bo gelên Kurd, Türk û Rojhilata Navîn bûye hêviyeke mezin. Ev biryara PKK'ê ji gelek dewletên dinyayê jî destek dibîne û ev destek roj bi roj mezintir dibe. Lê dewleta Türk, ji roja îlankirina şerrawestinê ta iro, ji bo şer bisikine tu gav neavêtiye. Berevajiyê vê, êrîşen xwe ji berê dijwartir didomîne û rawestandina êrîşen gerîla ji xwe re wek fersendekê dibîne.

• Hêzên gerîla heta niha li vê biryarê xwedî derketine û bi tu awayî êrîş pêk neanîne. Dema êrîşek bi ser wan ve hatibe jî xwe parastine. Êrîseke hêzên leşkerî û cerdevanan, li çiyayêni di nav Sason û Pasûrê de pêk hat. Li ser êrîşa leşker û cerdevanan, di nav herdu hêzan de şerekî dijwar derket. Di vî şerî de, 13 gerîla û 21 leşker û cerdevan hatin kuştin û rewşa şerrawestinê derbeyeke mezin xwar. Rûpel 8

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Nivîskar û nivîsandin  
Şerefçan Cizîrî

Rûpel 10

Eqilê Kurdan ê pêşî  
û paşî  
Amed Tigrîs

Rûpel 10

Leyla Qasim  
Adîl Duran

Rûpel 14

Danasîna lîstikên  
Kurdan  
Jîr Dilovan

Rûpel 15

Dîroka Soreşa Kuba  
Osman Özçelîk

Rûpel 6

Hevpeyvîn bi huner-  
mend Ehmedê Çep re  
Jana-Jan Dost

Rûpel 16

Konsera Koma Lorî  
îptal kirin

Rûpel 11

Li hember Yeltsin  
raqîbekî tûj:  
Routskoy

Rûpel 4



Piştî ilana şerrawestinê, êrîşen cerdevan û leşkeran ên bi armanca valakirina gundan jî dijwartir bûn. Heta niha bi dehan gund hatine hilweşandin û bi hezaran gundi koç kirine.



### QASETA SÎ Û SÊ GULLE Û NÛJENTÎ

Her gel, netewe ji aliyê muzîkê ve  
xwediye taybetiyan e. Pîvan, rîtim, teşe  
(form), melodî, armonî û heta dengê  
navber (koma) taybetiyêن herî girîng in.  
Mînak di muzîka Ewrûpî de dengê  
navber ango koma nîn e. Lê di muzîka  
Kurdî de heye.

Rûpel 13



### SERFIRAZÎ

Ez duhî li Diyarbekrê Şêx Seîd bûm  
Li Dêrsimê Seyid Riza bûm  
Li Mehabadê Qazî bûm  
îro jî li Zindanê Amedê,  
Xeyrî me, Kemal im, Akîf im, Çîçek im  
Doğan im, Doğan im, Doğan im.

Rûpel 12

# Em serê xwe natewînin!

Di sala 1945'an de ez li gundek li kèleka Eskîfê hatim dinê. Di heşt saliya min de bavê min ez danîm ber xwendina Quranê. Ez gelek bi fêm bûm. Min di şes mehan de Quran xetim kir. Ú bi dû re min hinek kitêbokên bicûk ji xwendin. Ëdi seydayê min ji bavê min re got: "Gerek ev ge de here cihê din li medresa bixwîne." Ú xelkê din ji, yên dosten bavê min jê re gotin: "Vi gedeyî bişîne dibistana Tirkân bila bixwine." Lë bavê min got: "Şêxî min, kurê min gelek bi fêm e. Ez bişînim mektebê? Tu dibêjî ci?" Şêx ji bavê min re got: "Na lawo, na ilmê Latînî la dînî. Yanî di ilmê Latînî de din tune. Ger tu kurê xwe bişîni mektebê wê bêdîn bîmîne." Bavê min ji nikaribû bêdiliya şêxî xwe bike ú ez neşandim dibistanê. Ez şandim gundekî din ji bo feqetiyê. Heş sal bi zikeki têr û pazdeyî birçî min li hucreyên feqehan xwend. Lë ilmê ku min dixwend. § ne bi zi manê dayika min bû. Tovbe min qet jê tiştek nedizanî. Hama seydayê me digot "Zeyd çû û zeyd hat" ú digot "Ne sara ne sara ne seru." Min heta camiyê xwend. Min qet tiştek ji wî ilmî fêm nekir.

Lë seydayekî min hebû. Kaledî ixtiyar bû. Xwedê jê razî be, wî pîr ji min hez dikir. Rojeke biharê gote min: "Kurê min kitêba xwe bîne, emê ji xwe re herin çolê. Hem emê bixwînin, hem ji emê geşt bikin." Ez û seydayê xwe çûne raserî gund. Em ji xwe re rûniştin. Dersa min wê rojê ji min re got. Pişti me ders xelas kir seydayê min pir-

sek wiha ji min kir, "Feqî niha tu ci tişt î?" Min got: "Seyda ez misilman im." Got: "Erê kurê min em tev misilman in. Yanî ez dibêjim qewmiyeta te ci ye?"

Hûn bawer bikin, min heta wê çaxê nizanibû, ez ci me. Hema min xwe misilman dizanibû. Seydayê min pîr bi vê nezanîna min eşîya ú aciz bû, stérkan di çavê wî de avêt û li halê nezaniya min giriya. Careke din li min zivirî ú got: "Kurê min em Kurd in û dîroka me ji heye û zemanê berê dewleta me ji me girtin û em ketin bin destê dewletê da girker. Heta devê wî geriya ji min re got û ji wê rojê pê ve esqa gelê min xiste dilê min. Çend beytê Seydayê Cegerxwîn ji min re nîvîsandin û êdî min ji wan pê ve tiştek nedixwend. Çiqas min ji wan fêm dikir agirê eşqa gel di dilê min de ges dibû. Temenê min 17 sal bû, bavê min ez zewicandim û di nozdeh saliya xwe de ez bûme xuwed. Çar zarokên min hebûn ez çûme leşkeriya dijmin. Di 73'yan de me mala xwe bar kir. Em hatin bajarê Batmanê, ez hinek însanê welatparêz li wê derê nas dikim û carina bi wan re li ser bûyeran gel em dipeyivîn. Lë hema em her car eyîn tiştan dibêjin, di sa-

la 1976'an de xorten me yên xwendevan û hemdemî li bajarê Batmanê bi fîkr û ramanen nû, yanî bi ilmê cihanê bi ristikasosyalist ji bo xelasiya neteweyî dest bi têkoşîneke nû dikirin. Lë belê hevalê me yên kevin, yanî kevneperest li diji van xortê nû disekinîn û antî propaganda wan dikirin. Digotin: "Ew bêdîn, hevalê kafran e. Ê ku he-

valtiya wan bike ew ji kafir e." Ji wan çend heban min ji nas dikirin û fîkr û ramanen wan û exlaqen wan pîr xweşik bû. Hema ez dikarim bibêjim ji wan hevalen xwe yên kevin min zûtir û man bi wan xortan anî.

Heta sala 1980'yi, min ji gorî xwe hinek xebat kir. Di sala 1981'ê de di sihê meha Îlonê de dijmin ez xistim binçav. Pazdeh roj li Batmanê û şest roj ji li bajarê Sertê ez bi hemû awayen işkencê hatim işkencekirin. Di nava van rojan de işkence ku li min hate kirin ku ez binivîsim wî kitêbek çêbîe.

Pişti 20 mehan ez hatim berdan. Lë belê roja ku hatim berdan min bêhtir bawerî bi xelasiya xelkê xwe anibû û min dijmin xwe gelek ji nêzik ve nas kiribû. Ú disa me dest bi xebata xwe kir. Di meha Mijdarê de hinek hevalen min hatin binçavkirin û li wan işkence hatibû kirin. Disa navê min ji dabûn dijminan. Lë ez vê carê neketim destê wan û ez reviyam. Ez pênc sal mame firar. Min zar û zêcê xwe ji, ji ber zordariya dijmin ku her roj bi ser mala min ve digirtin û tehde didan kulfetê min, revand û anî bajareki metropolê, kulfetê min giran bû. Neh zarokên min hebû. Lë çiqas perşanî ji derbas kiribin ji madîyetê, lë ji aliyê manevî ve min şev û roja xwe xiste yek û min nehiş perşan bibin. Yanî weke ku Serok ji dibêje; "Divê yê ku dixwaze bibe şoreşger pêşî şoreşî di bedena xwe de çêbîke û bi dû re ji di mala xwede çêbîke." Vêga şikir ji ARGK'ê re, zar û zêcê min ji hûr û giran

xwe û gelê xwe nas dikin. Di sala 1988'yan de ez disa hatim girtin û min gelek lêdan û iş-

kenceyên dijmin dîtin û ez çar meh li Girtigeha Batmanê mam. Ú bi dû re ez derketim, hatim gîham ba zar û zêcê xwe. Lë ez netewiyam û dijmin serê min dananî û min disa li gorî xwe dest bi xebata xwe kir. Çimkî êdi xew bi kêrî min nedihat. Gerîla li welatê min şerekî germ dikir. Dengê rime rima lingê azadiyê dihate guhê min û nedîhiş xewa min bê. Min li her derî dikir qîr li keç û xortê Kurdan. Min digot. "Rabin û herin welatê xwe, hûn ji bibin xwediyê rûmeteke mezin." Di 12'ê Îlonê de keçek û kurekî min xwe pêk anîn ku herin welêt. Lî bajarê Îzmîre bi tevî çend heb hevalen xwe ve ji aliyê dijminê faşîst ve hatin binçavkirin, yanî girtin û işkenceyeke mezin li wan ji kirin û bi dû re hatin ez ji girtim û em bi hev re xistin Girtigeha Bucayê. Em 3 meh ji li wir girti man û em hatim berdan. Lë ez ji we re bibêjim; mala xwe her tim di bin cav de ne.

Girtigeha hundîrîn ji ya derive xwestir e. Niha ji yek ji zarokê min winda ye, bi ku ve çûye nîzanim. Lë bi ku ve çûbe oxirawî ya xêrê be. Çimkî ez dizanîm ne riya baş be pê ve naçe. Ya dawî ez vê ji we re bibêjim, ez hê ji weki xortê ku 18 salî yê çeleng li ser piyê xwe sekinîme û ji hemû cure têkoşînê re amade me. Ez selav û hurmeta xwe ji we re rî dikim û xweşî û pêşveçûna we dixwazim.

Xalê Elo

## FERHENGOK

**Avteng:** Ji bo behr û deryayê, cihê teng (Boğaz)

**Berfin:** (Kardelen)

**Damisto:** Lülik kişandan (Kura çekme)

**Girav:** (Ada)

**Gorim:** (Görümce)

**Hejmêrmend:** Hesabgir (Sayman)

**Hek:** Xwenga mezin (Abla)

**Hevling:** Bacanax

**Hêvotin:** Perwerde kirin (Talim, eğitim)

**Hişmendi:** Şuur, hiş (Bilinç)

**Kal:** Fekî û zerzewata negîhiştî

**Kızirandin:** Ji şewitandina mü, por, pirç re tê gotin

**Kordunde:** Wareş, koroçax, kesê ku zar û zêcên wî/wê nîn e.

**Leven:** Qamîşê şeker

**Mehandin:** (Aşınmak)

**Nêrevan:** Dîdevan (Gözlemci)

**Notir:** Nobet

**Notirvan:** Nobedar

**Qaqijok:** Laleya derewîn (Yabanî lale)

**Sexbêr:** Teserûf

**Şilan:** Gula derewîn (Yaban gülü)

**Xam:** Xaka ne ajotî

**Xav:** Xwarina ne piiyayî

**Xunifandin:** Ji bo xwarin û vexwarinê lêhatin (Yaranmak)

**Xuyang:** (Görüntü)

**Zikreşî:** Kimreşî, dexesi, hesûdî

## Heyfa Gulan

Li Serhadê sê gûl vebûn Deşt û çiyan zû belav bûn Rengê wan ji gelek xweş bûn Kesk û sor û gulên zer bûn


Gazî keç û xortan bikin Ala rengin bilind bikin Gurên har gulan qetandin Heyfa gulan em hildin

Ciyayen Kurd pîr bilind in Cehşik tê de lotik didin Gazî heval Zinar bikin Heyfa Memo, em hildin

Ava Erez gelek sar e Xwîna Dicle tê de dere Gazî heval Alışer kin Heyfa Dicle em hildin

Kal û pîrên me, ban dikin Gelê Kurdan zû de rabin Gazî heval Delîl bikin Heyfa Sefkan, em hildin

**Heyfa Zinar**



simenê, jû nefes de woncenê zere xwe. Duyê cixara ïnan, jê dezî kuno gulo domanan. Zimistanê, wertê sobo de îsyana xwe vêsnene...

Domanê itayî zobi yê, Dêrsim. Nêsiya ro domananê to. Çimê xwe bervenê ver tim rakerdaye yê. Her sewe eyîn hewn vînenê, bado mezgê yîne de kullî eyîn çî maneno. Derde piye xwe ra en zaf nî tesîr cenê.

Qellesiya giranê naca de yêna diyene. Dêrsim. Wertê meyxanî de dest keno pro, telefonanê otomatîk de dewam ke-no. Feqet zulim nêqedino. Hepis, gonî, işkence, eve merdene dewam kenê. Bêaqilenî naca de yena miletî ver. Milet feqîr o, yê ke qewetin ê, danê dest ro, ci ra cenê.

Ez ki ita nîsen ro. Dêrsim. To ra hez kerden a, tore xesret

## Welatê domanâne azad re mektuve

To re jû mektuvê rusnen. Dêrsim. Teynayen xwe de we-de. Hurendiya rindekeniya to ra, sûka ke worte kefena teyne-yenî de vineta, a sûke ra...

Ver de to re tene ita re qe-sey kerî. Dêrsim. Sûka ke eve qehpeyenî, ev bêaqilenî weşîna, a sûke ra...

Miletê itayî jê ixaneti sulf o. Milet pêro, miyê ke solesen de sole lisene, jê yînû no. Her roze, eyîn sure de çerexinê ra vîndenê, hevalenî yîne vîr nîna. Pisewe kerxanenê itayî de ve hezaran milet gûrîno, eve hezaran kî weno, simeno.. Çenekê yîne bê tuman dem cenê bine lambanê meyxanî de. We ra tepiya vengê xwe beno nalyis. Naca de milet araqê xwe simeno. Bado jê tufangan, ev buwa reqî sanenê rawû. Bado ke bî pise-we, heta perozi rawû de kunê ra...

Febriqanê itayî de ev hezar milet gûrîno, eve hezar kî des-tanê ïnan re ser keno. Peyra, bonanê xwe de ev tutunî efkar

menden a. To her roze zaf kuna mi vîr, Dêrsim. Mektuva ke rusnena çenekanê Bextiyanan, honde yî mektuvan.

To wu ca de jê mesela kan a, Dêrsim. To de mordem e-reqê xwe nêsimeno. Zerê bûwaraqî de, ev serabî rawû de nêkunê ra. Weşîya bêbexteniya xwe nêşîno, rûyê însanan ro. Lewê to de milet eve umid şer keno weşîye re. Domanê ke peştiya Munzûre de şonê tîcî, yî domonî to de rê. Yê eke binê gozane girşî de jûbinî hez kene, yî kî to dê rê, Dêrsim. To de telefonê îxanetiye nêno diyene. Destana ta wertê efsaneyâ kane da lawuk a, jê wû welatê vesayî. Dêrsim.

To cayê birayenî û rindekenî ya, Dêrsim. To de domanî ev çimê bir mordemî re şer nêkenê. Tu welat a, bira wa, yar a... Vang ve mi de, mi berê lewê xwe, Dêrsim.. Çitur beno bibo!..

Atilla Halis

# Di cenazê gerîla de besdariya girseyî

**Navenda Nûçeyan-** Cenazê gerîla Abdulselam Kisaer (Cotkar) li gundê wî Kullika Tekmanê ku girêdayî Erzêromê ye, bi besdariya girseyeke gel hate binaxkirin. Gerîla Abdulselam Kisaer, di 18'ê Nisanê de li çiyayê Karliovaya Çebekcûr (Bîngol)'ê, di êrişike leşkerên Tirk de hatibû kuştin.

Tabûta Abdulselam Kisaer, bi ala kesk û sor û zer ve xemilândî, li ser milên 1000 kesen besdar û siloganên "Şehîd nemir in", "Bijî PKK, Bijî Serok Apo" heta goristanê birin. Li ser gora Abdulselam Kisaer, li ser têkoşînê û

jiyana wî axaftin hatin kirin. Nûnerên Komeleya Mafêni Mirovan a Erzeromê û nûnerên rôxistinê demokratik wek nêrevan besdarî cenazê bûbûn. Di merasimê de, mesajeke ARGK'ê ya Eyaleta Navîn, Serleşkeriya Qerargeha Bingehin jî hate xwendin. Di mesajê de, amadekariya hevalen sîlehê yên Abdulselam Kisaer ji bo alîkariya aboî û manevî tê ziman. Mesaj wiha didome: "Pevgirêdana bîranîna Abdulselam Kisaer, divê bi besdariya şerê çekdarî û rôxistinê xwe nîşan bide."

Piştî merasîma cenazê, bavê Abdulselam Kisaer Şâ-

ban Kisaer, ji mirovên ku ji bo serxwesiyê hatibûn mala wî re axaftinek kir. Şaban Kisaer di axaftina xwe de wiha got: "Kurê min, ji bo serxwebûna welatê xwe Kurdistanê gîhîş radeya şehîdbûnê. Di vê dema ku şer rawestiyaye de, dewlet bi êrişen xwe yên ser zarokên me durûtiya xwe nîşan dide. Em aşti dixwazin. Lî ew şer germ dikin. Kurê min, lawê Kurdistanê ye. Serê hemû Kurdishaniyan sax be."

Ji gundên cînar jî, gelek gundi besdarî merasima cenzeyê bûbûn. Hêzên dewletê, têkili besdar nebûn.



## Koma Berxwedan di Festîwala Muzîkê ya Navneteweyî de

**Navenda Nûçeyan-** Koma Berxwedan dê bi awayekî fermî li ser navê Kurdistanê besdarî Festîwala Muzîkê ya Dînyayê bibe. Ev festîwal, ji 5 salan ve ye ku tê sazkirin. Li ser navê Tirkîyê jî, Sezen Aksu besdarî festîwalê dibe.

Festîwal dê di 16-18'ê Tirmeh (Temmuz)'ê de li Almanya, li bajarê Hamburgê pêk were. Koma Berxwedan jî, li ser navê Kurdistanê ji aliye rayerdaren vê organîzasyonê ve hate vexwendin. Festîwal, ji 5 salan ve ye ku di meha Tirmehê de, konserên xwe pêşkêş bikin.

KOM)ê de didomîne. Koma Berxwedan, di nava vî 10 salî de, zêdeyî 20 qasetî dagirtiye û bêhejmar, di nav organîzasyonên çandî de cih gitriye.

Li ser navê Tirkîyê hunermenda Tirk Sezen Aksu hatîye vexwendin. Li gorî programê, dê Sezen Aksu û Koma Berxwedan di 17'ê Tirmehê de, konserên xwe pêşkêş bikin.

Organîzatorê Festîwalê Thomas Hemstege, ji bo vexwendina Koma Berxwedan li ser navê Kurdistanê wiha axivî: "Divê ev gelê ku ji bo hebûna xwe têkoşîn dide bê nasîn. Divê herkes xwe hînî vê yekê bike. Divê hebûna Kordan bê qebûlkirin. Wek gelên din Kurd jî, ji bo vê festîwalê hatin vexwendin. Divê êdî bê fêmkirin ku, bi şidetê tu tiş naçin serî. Dibe ku bi saya muzîkê

însan û netewe ber bi hev werin."

Festîwala Muzîkê ya Navneteweyî dê li sehneya vekirî ya ku di nava parka bajarê Hambûrgê de ye pêk were. Li gorî ku tê hêvîkirin, dê 10 hezar kes besdarî festîwalê bibin. Nûneriya Çandî ya Eyaleta Hambûrgê û gelek sazî jî destek didin vê festîwalê. Ji welatên curbecur 14 komên muzîkê besdarî festîwalê dibin. Çend ji van welatan ev in: Kurdistan, Tirkîyê, Polonya, Macarîstan, CDY (Civata Dewletîn Yekbûyî-Rûsyâ), İsrail, Cezayîr, Fas, Gambîa, Kamerûn û Benîn.

Komeleyen siyasi û yên Mafêni Mirovan ku ji welatên curbecur têrî festîwalê, dê standan vekin û li ser rewşa siyasi û jiyana civakî ya li welatê xwe agahdarî bidin gel.

# HAWAR

## Dilbixwîn

### Dibistana Azadiyê

**D**rastiyên din ji bir kirine. Em ne tenê geleki bêabûqatin, wisa jî em geleki bêdibistan, bêmamoste, bêrojnameyeke rojane û bê... bê... xwedî ne. Dagirkeran hemû nirx û hebûnên me talan kirine, avahiyên me rûxandine, dîwarên hêvî û hawara me hilwêsandine. Ne artêseke parastina sixletên neteweyî, ne tîrêjeke azadiyê, ne guleke serxwebûnê... Û ne jî çar diwarên ku em xwe pê biparêzin, dijminan hemû di bin piyan de perçiqandine. Gavênu niha têne avêtin, ji bo vejandina wan nirxên me yên neteweyî ne.

Rojname, navgînên ragihandinê ne. Nikare biaxive, bêziman e, deng jê dernayê, lê hema dikare dînyayekê bi xwe bîhesîne, dikare berdevkî û abûqatiya neteweyekê bike, dikare daxwaz û armanca wê neteweyê li seranserê cîhanê bigerîne û dostanî û biratiyê di nava gelan de ava û têkuz bike. Rojname, divê bi vê rolê rabbe. Ne weke rojnameyên Tirkan ên Bab-i Alî ku dijminatiyê di nava gelan de xurt dikin, rola fitne û fesadiyê dileyîzin. Anglo berevajî rola xwe ya ku ji bo wê hatine peyderkirin radibin. Bi wezifeya xwe ya însanî ranabin. Rojname, kovar, TV, radyo û hwd hemû navgînên ragihandinê ne.

Ragihandin par-

çeyekî jiyanê ye, aliyekejiyanê yê vala dadigire. Jê mezentir, dema ku bi rola xwe rabe dadgehekê, dadmen-diye dide pêş û kesen ku li dijî neteweyeke bindest bê qanûn zilm û zorê meşandibe, pîrsîyârî û mehkeme dike. Di tevgera rizgariya neteweyî de, xwedîye roleke gelekî girîng û mezîn e. Li hemberî navgînên ragihandinê yên dagirkeran alternatiyeke şoreşgerî ye. Ji ber ku ew ragihandina fermî ya dewleta karbidest û mêtînger ên ji hêla saziyên şerê taybetî ve têne birêvebirin, tenê bi karê fetisandina rastian û belavkirina nûçeyen derewîn û bûyerên xeyalî radibin. Bi rastî di dema germaya şoreşa rizgariya neteweyî de, rojnamegerî bi serê xwe şoreşek e. Gelekî mixabin, me hîna rola wê nas nekiriye, ji lew re em dibin çavan re lê dinêrin.

Weke ku di serî de hate gotin, em neteweyeke bêdibistan in. Dibistana hene yên dijmin in, dersên ku di wan dibistana de têne dayîn jî, ne ji bo me ne; dîroka me, toreya me, exlaq û kesîtiya me naynî ziman. Berevajî wê, dîroka xwe bi me didin naskirin, ziman û pîrtûkên xwe bi me didin xwendin. Heya ku em hînî zimanê wan dibin jî em zimanê xwe ji bir dikin, dîroka me li pêşîya çavêne me dibe dojeh (cîhenem), bi me we latê bav û kalan dibe odea mirinê. Ji lew re dibistanen niha li Kurdistanê ne yên me ne, yên dijmin in. %99 derew in, yekê terê rast e, ew jî di xizmeta wan de ye. Lewma gundiyen me ew dibistanen jehrdayînê ji xwe re kirine axurên dewaran. Rojnameya gel dikare wê valahiyê dagire, hem rola mamoste, hem jî rola dibistanê bileyize. Li aliyekeji dibe dibistan, dibe zanîngeh û şagirtan dertîne, neviyên pêşerojê, hêviyên serxwebûn û azadiyê.

**Werin em li şûna rojnameyên dijmin ên xwe bixwînin û xwedî lê derkevin! Werin em bibin nîvîskarên rojnameyên xwe, hem bibin şagirt, hem bibin mamoste û hem jî di dibistana xwe de dersên azadiyê bidin.**

# Li hember Yeltsin raqîbekî tûj: Routskoy

**Yeltsin, ji bo ku rê li ber xwe veke û iktî-dara Rûsyayê bi temamî bixe destê xwe, bi awayên curbecur dijberên xwe tesfiye an jî bêtésir dike. Yek ji wan dijberên wî Aleksandre Routskoy e. Bes alîkarê Yeltsin Routskoy, ne dijberekî ketûber û ji rêzê ye. Her çiqas heftiya çûyî rayeyên wî ji destêni wî hatin standin jî, ew welê zû bi zû bela xwe ji Yeltsin venake û wisa xuya dike wê serê Yeltsin pirr bi vî generalê komunist ê bi xwe bawer re, bişê.**

## Navbera Tirkiye û Rûsyâ dicemide

Di vê hefteya dawî de têkiliyên navbera Tirkiye û Rûsyâ bi awayekî berbiçav sar dabin û ber bi qetandinê ve diçin. Ev daxwaza cemidandina têkiliyan, cî teur û axaf-tinê rayedarê Federasyona Rûsyâ de xwe dide diyar-kin.

Bi taybetî gotinê Wezîrê Parastinê yê Rûsyâ wek tehdîdeke eşkere ji aliyê derdorêni siyasi ve hatin nirkandin. Wezîrê Parastinê Pavel Graçov, di civîna çapemeniyê de li Moskova gote ku, dewletêni alîkariya çekan dane Azerbeycanê ji aliyê Rûsyâ de tên zanîn.

Di axaftina xwe de Graçov Tirkiye wiha tehdît kir: "Em navê vê dewletê zanîn, ger îcab bike emê navê wê diyar bikin. Ev dewlet li coxrafayake pîr nêzîkî me ye û sîleh û teçhîzat dide Azerbeycanê. Di gera xwe ya Enquerê de ji min ev dîtin anî ziman. Di destê me de bel-geyên îspatkiranê jî hene"

Weke tê zanîn Tirkiye dewleta yekemîn bû ku serx-webûna Azerbeycanê nas kir. Nêzîkbûna Tirkiyê ber bi dewletêni Tirkî ve, Rûsyayê aciz dike û vê tewra Tirkiyê wek belavkirina panturkîzmê dinirxîne.

## Salvegera Riya Ronahî

Roja 17'ê Gulanê salvegera Rêxistina Riya Ronahî bû. Partiya Komunîst a Perû ku bi navê Riya Ronahî edî zehf tê naskirin, berî 13 sal dest bi şerê çekdarî kiribû.

Bi mebesta vê salvegerê Riya Ronahî, "Greva çekdar" ilan kir û li gelek deveran livbaziyyen çekdarî pêk anîn. Li paytexta Perû. Lîmâyê sê otobus û taksiyek ji ber ihlalkirina grevê, bi şewitandinê hatin cezakirin.

Wekî din gerîlayên Riya Ronahî tevî hemû tedbirêni ku ji aliyê hikûmetê ve hatibûn standin, gelek qereqol û navendîn leşkerî bombe kirin. Rêxistina Riya Ronahî roja 17'ê Gulanâ 1980'yi sindoqên hilbijartînê şewitan-dibû û dest bi şerê germ kiribû.

## Danîmarka Peymana Maastricht qebûl kir

Roja 18'ê Gulanê gelê Danîmarka ji bo peymana Maastrichtê çû ser sindoqan. Ji sindoqan rayen hatine avetin %56.8 "erê" derketin. Bi vê tercîha xwe gelê Danîmarka gavê ber bi yekîtiya Ewrûpa ve bi pêş ve bir.

Heta niha, ji xeynî Almanya û Brîtanya hemû dewletêni ku endamên Civata Ewrûpa ne, ev peyman qebûl kirine. Li Danîmarka kesen ji hêla çep li dijî qebûlkirina vê peymanê ne. Ji ber vê yekê di dawiya vê hilbijartînê de, di navbera hejmareke mezin kesen sosyalist û polisan de şer derket. Gelek erebe û navgînên polisan hatin tehrîpkirin.

**Nûçeyên Derve-** Van rojêni ku Serokê Rûsyayê Borîs Yeltsin pêsiya xwe ji siyasetvanêni muxelif û radikal paqîj dike û rayeyen dewletê hêdî hêdî dixe destê xwe, raqîbekî pîr dijwar û bi ramana xwe jê dûr, lê bi wezifeya xwe zêde nêzîkî wî, li pêsiya Yeltsin sekiniye û na di xwe dide. Ev siyasetvan û rayedarê dewletê ku bi tûjbûn û radikalbûna xwe tê naskirin, Aleksandre Routskoy e. Routskoy ku ji mîj ve bi helwesta xwe ya li hember Yeltsin tê zanîn, niha alîkariya Yeltsin dike. Yanê alî-

karê Serokatiya Rûsyâ ye.

Alîkarê Serokê Rûsyâ Routskoy, ji ber dijberiya xwe ya li hember Yeltsin, di pratîkê de ji wezîfa xwe hatiye avetin; yanê tu fonksiyona wî di rêvebirina Federasyona Rûsyâ de nemaye, bes bi awayekî resmî (fermî) hê ji wezîfa xwe didomîne. General Routskoy, ji meha Adarê ve dijberiyê li hember Yeltsin zêde kir û bi vê helwesta dijber pîren navbera xwe û Yeltsin hilweşandin û ji hingê ve ev şerê wan û dijwar her diçe geşir dibe; ci tê devê wan ji hev re dibêjin

û ci xerabî ji destê wan tê bi hev dikin.

Li gor Routskoy, Yeltsin welatê Rûsan ber bi hilweşandinê ve dibe û dike kavil. Ji bo ku Rûsyâ ji vê rewşa xerab xelas bibe jî, ev lehengê şerê Afganîstan xwe wek xelaskerê yekane dibîne û wiha dibêje: "Ji min pêştir tu kes nikare rê li ber hilweşîna Rûsyayê bigire."


Têkiliyên vî generalê ji xwe qayîl, tu car bi Yeltsin re baş nebûne. Hîna di dema Yekîtiya Komarêni Sovyeta Sosyalist (YKSS) de wî bi çavê demagogekî li Yeltsin dinêrt û bi taktîkeke bi hesab û kîtâp di Hezîrana 91'ê de bi Yeltsin re ji bo hevkariyê, xwe dixiste eynî listeyê û pê re diket hilbijartîna azad a Serokatiya Rûsyayê.

Di pêvajoya kampanyaya referandûma 25'ê Nîsanê de ev tewra xwe ya dijber domand û di axaftinê referandûmê de gelek rayedarêni hikûmetê yê bilind bi dejenerêkîn û serûbinkirina sistêmê sûcdar kirin. Lî, bi gelê Rûsyâ neda bawerkirin ku Yeltsin rayedareki xerab e û nikare rê li ber serketina Yeltsin bigire. Tevî vê yekê Routskoy dev ji êrîşen xwe ber nedaye, bi hemû hêza xwe ve bi ser Yeltsin ve dice.


Helbet Borîs Yeltsin ji di vê navê de vala nasekine. Wî jî, heftiya çûyî General Aleksandre Routskoy bi ixa-netkîrinê sûcdar kir û hemû rayeyen wî ji destêni wî derxistin.

Rojnamevanêni rojnameya Liberationê Bernard Cohen bi vê hevoka li jêrê şerê navbera Serokê Rûsyâ û alîkarê wî tîne zimên: "Routskoy mirovî bonapartîst e, bes Yeltsin jê bonapartîsttir e; ev e dijwariya herî mezin li pêsiya Routskoy."

Bê guman, Routskoy bi tu awayî bela xwe ji Yeltsin venake û di hilbijartîna Serokatiya Rûsyayê de wê berrendamiya xwe li hember Yeltsin deyne, ku hilbijartîn berî Hezîrana 96'an bê lidarxistin. Bes li gor encama referandûma 25'ê Nîsanê wisa xuya dike ku, hilbijartîn berî Hezîrana 96'an hêviyeke pîr qels e.



Routskoy, bi tu awayî meydanê ji Yeltsin re bernade.



Texte Borîs Yeltsin diheje.

# Waliyê Manîsayê berhevdaniyê dike



*Malbatî Zekî Gezer bi êrişä gelê Hacîhalillerê rûbirû ma. Di vê êrişê de, Perizade û Belkîz Gezer bi sivikî birîndar bûn. Pişî pevcûnê, ji bo ku pevcûn zêde nebe hêzên dewletê li dora malen Kurdistan nobetê digirin.*

**Navenda Nûçeyan-** Pevcûna ku di 15 Gulanê de di navbera manav Sadik Acar û Zekî Gezer de li navçeya Hacîhaliller a Manîsayê derket, waliyê Manîsayê dixwaze bi-ke şerê Kurd û Tirk.

Di 15 Gulanê de li Hacîhaliller şerekî adlı di navbera Zekî Gezer (Kurd) û Sadik Acar

de derdikeye. Lihevxitin ji ber deyn derketiye. Lî pevcûn ji pevcûna du kesan dertê û dibe lihevxitina gelê Kurd û Tirk. Li Hacîhalillerê 3 hezar mirov dijî. Ji 3 hezaran mirov jê Kurd in. Kurdên li Hacîhalillerê di rez û bexçeyan de dixebeitin.

Kurdên li navçeyê ji malen-

xwe dernayêner derve. Di vê pevcûn û qirînê de, ji herdu aliyan birîndar û girtî hene. Perizade Gezer û Belkîz Gezer ji, ji aliye gelê Tirk ve hatine birîndarkirin.


Li ser qewimandinê walî û serokê Belediya Manîsayê tênavçeyê. Walî Samî Sönmez li gorî daxuyaniyên Se-

rokê Belediya Hacîhalillerê Mustafa Balci emir daye ku, Kurdish ji navçeyê biqewirînin.

Serokê Belediya Hacîhalillerê Mustafa Balci wiha gotinê xwe domand: "Kurd û Tirk bira ne. Em lihevxitina Kurd û Tirk naxwazin. Bi salan e ku em bihev re dijin. Li

navçeyê ji herdu aliyan ve ji qız hatine dan û standin. Hin kesen ku ji Kurdish nerazi ne hene. Ji ber vê yekê dixwazin vê pevcûnê bikin şerê Kurd û Tirk. Waliyê Manîsayê Samî Sönmez dibêje: "Kurdan ji vê derê biqewirînin, kar nedîn wan, ê ku karê wan qediyabe jê vê bişînin."

## Rojnamevanê Ingilîz li sînor hate girtin



Andrew Norman Peny

Rojnamevan û wergêre Ingilîz Andrew Norman Peny, di vegera geşta başûrê Kurdistanê de, di sînorê Tirkîye de, ji ali polîsîn Tirk ve hate girtin. Ü pişî ifadegirtina dozger ew şandîn girtîgehê. Rojnamevan Andrew Norman Peny, bi qûr-yetiya PKK'ê tê tewandarkirin.

Peny, demeke berê, ji bo rewşa li başûr hin bibe û nûçe bigihîne ajansa ku pê re dixe-bite, çûbû başûrê Kurdistanê û di vê navê de, serdanek li qampa Zelê ji pêk anibû. Li ser riya vegerê, ew û rojnamevanê Özgür Gündemê Faik Bulut hevûdîn dibînîn û bi hev re dikevin nava sînorê Tirkîye. Di sînor de, polîsîn Tirk ew digirin û dest datînîn ser belge û dokumantîn wan. Faik Bulut pişî bi du rojan tê berdan, lê Peny bi qûr-yetiya tewandar dikin û dişinîn girtîgehê.

Andrew Norman Peny, endamê Yekitiya Rojnamevanê Neteweyî yên Ingilîz e. Ev sazî, li dînyayê saziya herî mezin a rojnamevanan e û 29 hezar enc.., nîn wê hene. Li ser girtina Andrew Norman Peny, ev sazî bi daxwaznameyekê serî li hikûmeta Tirk da û berdana wî xwest.

Weke tê zanîn, di sala 1992'an de ji, rojnamevanekî Alman disa di sînor de û bi eynî tewandariyê hatibû girtin. Rojnamevanê Alman Stephan Waldberg, di mehkema Tirk de, wek qûreyeyê PKK'ê hatibû tewandarkirin û 3 sal û 9 meh ceza girtibû.

## Bombeya leşkerî şivanek kuşt

**Navenda Nûçeyan-** Li Bîlisî gundê Alûka, di destê şivanekî 15 salî de bombeyeke leşkerî teqîya û laşê şivan ji hev parçê kir.

Roja 17'ê Gulana 1993' yan, şivanê gundê Alûka Kenan Akbulut, li çiyayê ku nez lê diçerîne, bombeyeke leşkerî dibîne û bi xwe re tîne malê. Kenan Akbulut, dixwaze bombeyê bi bîvir parçê bîke û bombe bi derba pêşîn ve dîteqe. Kenan Akbulut bi teqîna bombeyê re parçê parçê dibe û dimire. Gundiyen Ke-

nan Akbulut didin xuyan ku bombe, bombeyeke leşkerî ye. Li hêla ku Şivan Kenan Akbulut vê bombeyê dîtiye, her tim operasyonê hêzên dewletê pêk tênu û wisa dixuye ku, ev bombe ji bermahiyê van operasyonan e.

Bi teqîna bombeyê re, diya Kenan Akbulut Ayşe Akbulut û xwişka wî Şehrînaz Akbulut ji birîndar dibin. Birînen herduyan ji giran in û niha li Nexweşxaneya Bîlisê ne.

Birayê Ayşe Akbulut Hamza Karakuş ji dide xuyan ku,

di wan demen dawî de, li herêmê gelek operasyonê dewletê pêk hatine û ev demek e gundiyan gelek bermahiyen van operasyonan wek bombe, parçeyen fişekan û hwd. dîtine. Li aliye din, xortekî 14 salî bi navê xwe İbrahim Erkol, li qûntara çiyayê Cûdî pêl mayînekê kir û ji piyekî xwe bû. İbrahim Erkol, tevî kalekî, ji bo berhevkirina êzingan derketibûn Cûdî. Weke tê zanîn hêzên leşkerî, li çi-yayê Cûdî bi hezaran mayîn raxistine.

## Demîrel bû serokkomar

**Navenda Nûçeyan-** Serokwezîrê Tirkîye Süleyman Demîrel di tûra sêyemin de bi 244 rayan bû Serokkomar. Demîrel pişî mirina Serokkomarê Heştemîn Turgut Özal bû yê nehemîn.

Di tûra sêyemin de ji bo serketina Demîrel pêdîvî bi 226 rayan hebû. Lî Demîrel bi desteka MHP'ê (Partiya Tevgeriya

Neteweperest) 244 ray stand û bû serokkomarê nehemîn û heta ku serokwezîrek bê hilbijartîn di nav partiya DYP'ê (Partiya Riya Rast) de, dê şirîkê hikûmeta koalisyonê Serokê Giştî yê SHP'ê (Partiya Sosyal-demokrat a Gelparêz) û Alikarê Serokwezîr Erdal Înönü li cihê serokwezîriyê binêre.

Pişî hilbijerîna 16.5.1993'

# Ambargo berxwedana Kubayê neşikandiye!

**Osman Özçelik**

Em ji Tirkîyê neh û nîv mirov bûn. Ji sendikaya petrolê: Serokê Giştî Munîr Ceylan. Serokê Liqa (şube) Enquerê Musa Özkan. ji Navenda Giştî Mansur Burgucu: ji rojnameya Milliyetê Nazim Alpman; ji rojnameya Cumhuriyetê Kemal Gökhan Gürses: Ji Partiya Keda Gel ez û Ahmet Kaya (hunermend). Ew, jina wî Gulten, hevlinge wî Mustafa û keça wî ya delal û biaqil, keça şes salı Melis.

Min li jor neheqî li Melis kir. Min ew bi nîv mirov hesiband. A rast, ne wilo ye. Melisa pispot. Melisa qure divê bi yek û nîv mirov bê hesibandin. Anglo em, deh û nîv mirov bûn.

Em nûnerên Tirkîyê bûn. Nêzikahiyeke kûr di nava me de hebû. Em hemû dostê Kuba bûn. Me hemûyan dixwest "Kubaya sosyalist" bîji. Ji bo pêşkeshiya dostaniya xwe, em bîst saetê wê li hewa di balefirê de, li ser hev bîst û çar saet ji riya dûr hatibûn Hawana. Viana (Avûsturya), Newfauna (Qanada), Holguin (Kuba) û Hawana. Em li ser vê riyê firiyanabûn.

Dostaniya Kuba, di vê rîwîtiyê de hevaltiyeke qenc û ji dil di nava me de pêk anîbû. Va ye, xewna me bi cih hatibû. Em li "Plaza Revolucionario" (Meydâna Şoreşê) bûn. Fidel efsanewî bi deh gavan dûrî me ye. Herkes li dû Fidel e. Bes yek mirov heye ku bi du gavan di pêşoya Fidel de ye. Ew ji. Serokê CTC'ê (Confé-

deracion de Trabajadore de Cuba" (Konfederasyona Karkeren Kuba) Pedro Ross e. Miroveki pêncî salı, bi dengekî mîrxasî û ji xwe bawer axivî. Serokê CTC'ê miroveki dureh (melez) e. Ne spî û ne resik.

Di Yekê Gulana 93'yan de ya li Hawana, hew ew peyivî. Fidel û hemû kes li wî guhdarî kîrin. Ew Serokê Karkeren Kuba bû û cejn, cejna karkeran bû.

Em li cihê mîvanen biyanî, di réza yekemîn de bûn. Ji bo dest girêdana stûyê xwe, her yek ji me destmalekê dabûn me, li serê "An welat, an mirin" nîvisibû.

Girav, Kuba, ji aliyen împarîyalîstan ve çaralî hatiye girtin. Danûstandinê wan birrîne. Berhemîn Kubayê bi gîranî sekir e. (%80). Firotina derveyî ya sekir betal bûye.

Ambargo li Kuba jiyana aboriyê anîye nîve nîv. Hilberîna sekir di salê de, ji 13 hezar ton da-ketiye 7 hezar ton. Pêwistiya Petrolê ya salê, 13 hezar ton e. Sala çûyî 1.3 hezar ton petrol ji erdê xwe deranîn û 4.7 hezar ton ji, ji derve hatiye kîrrîn.

Xwarin pirr kêm e. Serê mirov rojê 80 gram nan; mehê 250 gram goş belav dikin. Fa-

sûlén reş, birincê Vietnamê û kartol, xwarina yekemîn e.

Hewceyên paqîjîyê: weke sabûn, şampûan û deterjan bi destê kesî naeve. Qalibek sabûn diyariyeke herî mezîn e.

Di nava vê tunebûnê de ji, Kubayî ji halê xwe razî xuya dikin. Ew zanîn ku ev kêmasyîn hanê, ne ji ber rîveberiya xerab e. Daxwaza împarîyalîstan fetisandina şoreşa Kubayê ye. Kubayî bi vê dizanîn û şoreşa xwe di-parêzin. Dibêjin: "Emê hêviyê bi-din jîyandin."

Li paş cihê pêşwaziyê (protokolê) heykelekî spî yê pênc ses

mîtroyî heye. Ji kevirê helan (mermer). Ew Jose Martî ye. Di dîroka Kuba de Jose Martî cihê zehf girîng digire. Kubayî ciqas ji Qastro û Che hez dîkin ji, cihê Jose Martî di dilêwan de cihê ye.

Jixwe li tevahîya Kubayê heylênen Qastro û Che nayen dîtin. Pişti şoreşê qanûnek anîne der: "Divê tu wêne û heykelên ser-werên ku dijîn, li tu cihan neyê danîn. Dîsa navê tu serwerî ku li jîyanê ye, li sikakan, li kuçan û libajaran neyê danîn." Ji ber vê yekê, wêneyen Fidel nayen dîtin, wêneyen Che pirr in. Belê ez le-qayî heykelên wî nehatim. Hebe tunebe Jose Martî. Jose Martiyê reşik. Çerm û hestî. Mezinê Kubayê yê herî mezîn.

Li paş heykelê J. Martî, li do-ra panzdeh mîtro birdariyek (abîde) heye. Bala min kîsand. Di qesrbendiya (mîmarî) Kubayê de avahiyen wiha berbiçav tun in. Ev teherî (tarz) nizanim ji ku girtine. Em hemû di himbêza J. Martî de ne.

Li jîrî me rojnamevan û tele-vizyon: li hember me Navenda Partiya Komunist a Kubayê heye. Wêneyen Che yê bi dest cêkirî hatiye daleqandin. Di dawîya me-rasimî de, bi sedan kevokên bi rengên ala Kubayê hatine neqîsandin, wê bêne firandin.

Di navbera me û Che de rîheye. Min tu riyen wiha fireh nedîtibûn. Bi destpêka muzikê re. Fidel serê meşa gel kîsand. Ü bi dû wî re, bi sed hezaran gel me-siya.



Welatê Kuba seranser bi wêne û hêkelê Jose Martî dagirtî ye.

## DİROKA ŞOREŞA KUBA

Kristof Colomb ji İspanya dabûrê, hêviyâ wî derbasbûna okya-

nûsê û li ser rûyê erdê welatê ku nehatiye nasîn, dîtin e. Bi Taybetî li Hindê digeriya.

Di sala 1492'yan de gîhîştibû girava Kuba. Pişti Kuba dit,

ecêbmayîna xwe veneşart. "Li ser rûyê erdê min tu welatê wilo axdewlemend û cihêkî wilo xweş nedîtiye" got.

Ev hevoka (cimle) K. Colom, bû sedemê dagirkirina Kuba. Êdî ewrekî reş xwe li ser Kuba danibû. Ewrekî wisa reş ku, pişti 467 salan bi şoreşa sosyalist, di pêşajoya Fidel Castro û Ernesto Che Guevara de hate belavkirin. Di sala 1959'an de gelê Kubayê gîhîştin tîrîjîn rojê.

İspanyoli ketin nava Kuba. Sal 1511 bû. Pişti dagirkirina Kuba bi 50 salı, li Kuba pênc hezar Kubayî mabûn. Bi kuştin û bi qirkirinê, gelê Kubayê ji navê rakiribûn. Kubaniyan bindestî û koletî nedixwestin. Qirkirin bûbû qedera wan.

Ji bo keda dest, ji Efrîqa reşik anîn. Ji Hindistanê, ji rojavayê Ewrûpayê kole û xulam anîn.

Di salén 1530'yan de xulam rabûn ser lingan. İspanyoliyan zaf xwîn rijandin. Di demeke kurt de Hawana bû navenda dâ-nûstandinê. Li Kuba levenê şekir (qamişê şekir) zaf û bi rûmet bû. Şekir, titûn û eyar malen dâ-nûstandinê yên seretayî bûn.

Di sedsala (qirnê) 18'yan de, di navbera 1717 û 1723'yan de gundiyan sê caran serî hildan. Bes, feyde neda.

272 hezar mirov di sala 1775'an de li Kuba dijîyan. Pişti 40 salı ew bûn 550 hezar. Hawana mezîn û geş dibû. Êdî dewletên din ên dinê ji, çav ber-dabûn Kuba. Roj bi roj reşik zêde dibûn. Du caran bi serê xwe li hember dagirkiran şer kîrin, belê dîsa şikestin.

Rizgariya neteweyî ya Kuba di 1812'an de paşve çû. Wê salê Qanûnê Bingehîn hatibû der. Bi Qanûnê Bingehîn re piranî û gumrehî çebûbû. Li İspanya di sala 1836'an de xulamî ji holê hatibû rakirin. Bes, li Kuba û li Amerika Latînî xulamî dom dikir.

Helbestvanê Kuba Placido di şerê 1843'yan de hate girtin. Ü gullebarankirin.

Di dawîya sedsala 17'yan de, İngilîz û İspanyolî li hevdu dikin. Kuba ji İspanyolan re, Florida (îro di nava erdê Amerika de ye) ji, ji İngilîzan re dimîne.

Îro gelê Kuba tevlîhevî ye. Ji Efrîqa, Amerika, Ewrûpa reh giratiye.\*

Sal dizivirin û li Kuba em tênsala 1892'yan. Bi navê Jose Martî şoreşgerek dixuyê. Di vê salâ de cara yekemîn J. Martî "Partido Revolucionario Cubano"ango, Partiya Şoreşgerî ya Kuba ava dike. Partî, yekbûna

karkeren navneteweyî diparêze. Xebata xwe ya siyasi li ser vê riyê dike. J. Martî ji bo şerê serxwebûnê ji, Qomîteyên Şoreşê pêk anî bû. (El Comite Revolucionario)


J. Martî hem hemdemê K. Marks hem ji hemdemê Lenîn e. Dema ku fikrîn Marks li Ewrûpa belav dibû, Jose Martî ji ew fikir li Kuba belav dikirin. Haya J. Martî ji Marks tune bû.

Dîsa wî bêyi Lenîn digot: "Divê şoreş û şer di bin serokatiya partiye de bê dayîn."

Marks li ser bir û bawerîyê (teorî), ew li ser pratikê mijûl dibûn. Gotina şoreşê, J. Martî kîribû ziman û dîroka Kubayê. Jose Martî, sembola "rizgariya neteweyî" bindest e. Sermayedarîn Amerika, di sala 1880'yan de hatibûn Kuba. Firotina derveyî yê şekir û titûn, ji sedî not û heşt ketibû desten Amerika. Ew sal aboriya împaratoriya dagirkela İspanya di rewşeye xerab de bû. Sermayedarîn Amerika dixwestin Kuba ji İspanyoliyan bikirin.

\* Xulamî, ji aliyê Carlos Castillo ji holê té rakirin. Carlos Castillo, demokratekî bajarı ye û xwediye palûka şekir e. Sal dawîya qirnê 19'an e.

Wê bidome



### NASNAMEYA KUBA

Nifûs (Gelhe): 10.582.000 (1990) Paytext: Hawana  
Bajarê Mezin: Hawana: (2.077.000)  
Santiago de Cuba: (397.000) Camaguey: (274.000)  
Guantanamo: (195.000) Bayamo: (115.000)  
Zimanê Fermî: İspanyolî Pere: Pezoyê Kuba  
Ol (Dîn): Katolik - Ortodoks Berhem: Şekir, tütün, birinc, qehwe, nîkel û fêkiyên tropîk, hindik petrol.  
Dirêjbûn: 1.600 km. Firehbûn: 100 km.  
Rûpiş (Aqar): 111.000 km2  
Kûrbûna Oqyanusa Atlasê: Li dor Kuba: 1000-2000 m.  
Li Delava Meksika: 4000-5000 m.



Di ramanê de sabîti û harîti, nîşana debengiyê (ehmeqiyê) ya herî eşkere ye!

*Publîs Syrus*

# Bavo vêca bavo ye

Mizgîn li we, mizgîn li we. Bavo derkete koşkê. Cihê herî bilind, xewnên wî hatin cih. Édi li şûna rehmetî Özal ê qamkinik Golikvan Silo bibexşînin Bavo heye. Ma Bavo heft carî li vî welatî serokwezirîjî ji nekiribû?

Xwedê ji xêrnexwazan ne razî be, ne dihiştin Bavo derkeve cihê herî bilind ê vê dînyaya derewin. Lé ev ji hebû, dema general derbeyen leskerî dikirin keysê didan Bavo ku, şewqa xwe bibe. Çavnebarê Bavo bi navê rexneyan, tinazên xwe pê dikirin. Digotin Bavo ev çend car e ku cihê xwe ji leşkeran re dihêle û radike şewqa xwe direve ji ber wan. Bavo ji xweş bersiva wan dida, digot. "Ma minê ji wan re bihiştî"

Min çavê te xwaro, ma cihê bila sebeb ji te re gotine Bavo. Ev e sî sal ku tu li Tirkîyê siyasetê dikî. Édi te emrê xwe xwaribû. Ma Evrenê ku te ji hikumetê anîbû xwarê ji negoti-

bû. "Serokkomartî heqê Bavo ye. Şest, heftê sal emrê wî he ye."

Nebî ji ber kalbûna te riya koşkê ji te re vekiribin. De nalo ev ji ku derket. Bavo tu bi heq û mafê xwe derketî. Mine-ta Bavo ji kesî re nîn e.

Dost û dijmin ji dizanîn li

hember serokkomariya te derdiketin. Te nediecibandin. Digotin ku navê Bavo xwedêne-giravî di tiş miştîn pîsik û bertîl xwarin marinan de derbas bûye, bila pêşî van safî bike.

Welle, welle eniya Bavo bilind e û zimanê wî ji direj e. Ewênu ku dixwazin rûyê Bavo

reş bikin ew bi xwe ji rûrêş in. Çawa rûyê wan digire ku behsa bertîl û neheqî miheqîyan dikan.

Bavo tu guh mede wan. Bi serê bavê xwe bikim, Bavê min gula siyasetvanan e. Ew serê gurî ci teq û reqan dîtiye bi tene Bavo dizane. Ma li Tirkîyê xebata ji bo siyasetê ewqas rehet û hêsan e. Hûn dizanîn

ku çiqas lep û terpûsk li sere Bavo ketine ku heta bû serokkomar.

Lé Bavo ev gel bêşêkr e. Tu carî qencî li wan nayê. Tu ji dizanî ku ev gel layiqî kesê mîna te ne. Gel û Bavo li hev pîroz bin.

**Zana Farqînî**



gorî şertê vî welatî tu mîr, siyasetvan û heta gelxapînok bibore min nexwest wê bibêjîm ji devê min felitî, di ser te de hene? Na bi Xwedê, divê mirov destê xwe bide ser wijdanê xwê û bibêje şert û mercen ku ji bo serokkomariyê dihatin xwestin, bi zêdebûn di tê de hene. Lé ez nizanim, hinek li

**JÛJÎ...**

**Doğan Güzel**



*Publîs Syrus*

# TİR

Musa Anter



## Mitterrand

Pirseke me Kurmancan heye. Dibêjin ku Xwedê ji yekî bistîne pêşî eqilê wî distîne. Ez dinêrim hikûmeta me ji wek vê yekê ye, Xwedê eqilê wê jê standiye. Binêrin bê hikûmet û qeşmerên wan ên rojnamevan dibêjin ci?

1. Mitterrand gotiye: "Ez neyarê terorîzmê me". Lê wiha xuya ye ku di gotina Mitterrand de PKK terorist nayê dîtin.

2. Dibêjin jina Mitterrand li Japonya ji Kurdan re pereyan û alîkariyê dide hev. De îca li vî işî binêrin, hîn ji Tirkê me fêm nakin ku Mitterrand ji hatiye Tirkîyê ji Fransa re pereyan dide hev. Min lîsta wî dît, bê çiqas îhale û ticareta Tirkan zeft kiriye. Lê di vê navê re mîrik gotiye ez li hemberî terorîzmê me.

**Çapemeniya Tirkan û hikûmeta Tirkan wek hev şeqseqçî ne, vê nabêjin wek mizgînekê. Dibêjin Mitterrand gotiye ez miqabili terorîzmê me. De îca li dînyayê teşkilateke polisan heye, jê re dibêjin interpol. Dema mezinê wan hate Tirkîyê rojnamevanan jê re got: "Çima hûn PKK'ê terorist qebûl nakin?" Wî got: "PKK ne terorist e, mucadeleya xwe ya milî didin."**

xwe nexin nav işê me." Lê ez dinêrim ku, hûn li deviyê xelkê digerin ku hema rast derew pif bikin we. Mitterrand hat û çû tim got: "Erê ev dewra pêsiya me, em li hidûdê dewletan digerin ku neyên guhertin. Lê me divê di hundirê van hidûdan de her miletik rehet be, kes li kesî zilmê neke. Xwesteka me ji hikûmeta Tirkîyê ew e ku heqê Kurdan ên demokratik û kulturî bi her a-wayî bidine wan." Çapemeniya Tirkan û hikûmeta Tirkan wek hev şeqseqçî ne, vê nabêjin wek mizgînekê. Dibêjin Mitterrand gotiye ez miqabili terorîzmê me. De îca li dînyayê teşkilateke polisan heye, jê re dibêjin interpol. Dema mezinê wan hate Tirkîyê rojnamevanan jê re gotin: "Çima hûn PKK'ê terorist qebûl nakin?" Wî got: "PKK ne terorist e, mucadeleya xwe ya milî didin." È herhalde Mitterrand ji vê zane. Ji ber vê yekê dibêje ez neyarê terorîstan im. Di binê vê şitexaliya wî de ev heye: PKK ne terorist e. Ma ku Mitterrand PKK terorist qebûl bikiraya wê jina wî çawa ji wan re pere û alîkarî bida hev. Gere ji na xwe berdaya.

Ne li jor me got ku Xwedê ji insanekîê bistîne pêşî eqilê wî/wê distîne. Ez yeqîn dikim hikûmeta me ji eynî wiha ye.

16.4.1992

*Ji roja îlankirina wê ve, dewletê gelek caran şerrawestin îhlal kiriye...*

# Şer bi vî awayî nasekine

**Serrawestina ku PKK'ê ilan kiribû, ji bo gelên Kurd, Tirk û Rojhilata Navîn bûye hêviyeke mezin. Ev bîryara PKK'ê ji gelek dewleten dînyayê ji destek dibîne û ev destek roj bi roj mezintir dibe. Lî dewleta Tirk, ji roja îlankirina şerrawestinê ta iro, ji bo şer bisekine tu gav neavêtiye. Berevajiyê vê, êrîşen xwe ji berê dijwartir didomîne û rawestandina êrîşen gerîla ji xwe re wek fer sendekê dibîne.**

**Navenda Nûçeyan-** Hêzên leskefî û cerdevanan, roja 16'ê Gulân li çiyayêni di navbera Pasûr (Qulp) û Sasonê de, êrîşî ser grûbek gerîla kirin. Bi dû vê êrîşê re, balefir û firokeyên Tirk ji, bombe reşandin ser grûba gerîla û şer her ku çû dijwartir bû. Şer bi vî awayî heta tariya şevê domiya. Li gor çavkaniyêni gerîla û nûçeyen ku ji herêma şer têن. zêdeyî 21 leskefî û cerdevanan ji aliye gerîla ve hatine kuştin. Di şer de 13 gerîla ji bi bombezên firoke û balefirin mirin. Weke têzanîn, dewlet di-bayanen xwe de kuştîyên xwe veşartibû û tenê kuştîyên PKK'ê nişan dabû. Li aliye din 2 gerîla ji bi birîndarî ketin destê leskefîn Tirk.

Li gor çavkaniyêni gerîla yêna Eyaleta Amedê, beriya şer bi şevelê, grûba gerîla di hêla şer de bi cih dibe. Di dema bicihbûna gerîla de, cerdevanan herêmê wan dibînin û di nav cerdevan û gerîla de ber bi sibehê ve şer derdikeve. Dû re hêzên leskefî xwe digihîn hêla şer û bi dû wan re ji, balefir û firoke ji tevi şer dibin. Tevi vê hêza mezin, gerîla heta êvarê li ber xwe dide û tu windabûn ji hêza gerîla çenabe. Di vê navê de, zêdeyî 21 cerdevan û leskefî ji aliye gerîla ve têne kuştin. Li ser vê yekê, ber bi êvarê ve hêzên leskefî û cerdevan ji hêla şer vedikişin û pişti vê vekîşinê, bomberarana balefir û firokeyên leskefî gurtir dibin. Gerîlayen ku têne kuştin, di vê êrîşa balefirin de têne kuştin.

Li gorî ku tê beyankirin, ev gerîla ji tabûra Şehîd Kendal û ji grûba Şehîd Siyar in.

## CENDEKÊN GERÎLA LI SER HEV VEŞARTIN

Gerîlayen ku di vî şerî de hatin kuştin, li Pasûrê, ji aliye beleşîye ve di gorek bi tenê de, li ser hev hatin binaxkirin.

Cendekêni 13 gerîlayen ku di şer de hatine kuştin, ji aliye tîmîn taybetî ve, di erebeyeke çopê de, tînin Pasûrê. Cendekêni gerîlayen, pêşî dibin Nexweşxanaya Pasûrê û dû re ji wilî li ser hev teşhîr dikin.

Serokçawîsê Qereqola Pasûrê Recep Cömert, cendekêni gerîla nişanî gel dide û dibêje. "Dê da wiya we hemûyan wiha be." Pişti vê teshîrînê, cendekêni gerîla ji

nû ve diavêjin erebeya çopê û teslimî belediyê dikin. Belediye ji, li Goristana Şehîdan, çalek diko le û 13 gerîlayen kuştî, li ser hev di vê çalê de binax dikin. Li ser vê tewra belediyê, gel belediyê protesto dikin û di vê binaxkirina li ser dilê hev de. Serokê Belediya Pasûrê İhsan Ülgen berpirsiyar digirin.

Xelkê ku ji bo teşhîskirina gerîlayan diçin ser cendekan, tu yek ji gerîlayan nas nakin. Lewre tîmîn taybetî, pişti kuştina gerîlayan cendekan gullebaran kirine û şerî hemûyan parçê kirine.

Ajansa Nûçeyan Kurd-Ha, navê gerîlayen ku di vî şerî de hatine kuştin belav kir. Navê gerîlayen kuştî ev in: Zeynî Gümüs (Zana- Nisêbîn), Nedim Enîn (Huseyîn- Diyarbekir), İdrîs Çetînbal (Rizgar- Hezo), Mehmet Metîn Kulakan (Dilkaz, ji gundê Babakaya), Zeki Sapan (Merwan- Farqîn), Şeyhîmus Özmen (Kemal- Diyarbekir), Zinar Filiz (Elişer- Diyarbekir), Taha Durmuş (Apê Mûsa- Hezo), Nazmî Akar (Berxwedan- Bismîl), Yılmaz Kazakçi (Dilbirin- Farqîn), Rauf Gün (Xerzan- Farqîn), Ziya Zengin (Hebûn- Antalya) û Ergin Aslan (Rêzan- Hezo). Li aliye din navê herdu gerîlayen ku bi birîndarî ketine destê dewletê ji ev in: İdrîs Çetînbas (Hezo), Bahri Yakici (Farqîn). Ev herdu gerîla bi birîndarî li Diyarbekir di işkencyê de ne.

Li gorî ku hêzên gerîla didin xuyan, rewşa şerrawestinê, bi vê êrîşa dewletê derbeyeke mezin xwariye û hêviye domandina şerrawestinê şikandiye. Li gorî daxuyaniyêni gerîla, hêzên leskefî yêna dewleta Tirk, bi hemû hêza xwe ve êrîşî ser gerîlayan dike û ji bo imhakirina gerîla operasyon û kemîn xwe didomîne. Ev ji, gerîlayen ku dixwazin şerrawestin neyê îhlalkirin, di zorê de dihêle.

## PROVAKASYONÊN CERDEVANAN

Bi destpêka şerrawestinê re, cerdevan ji ber tîrsa ku wê ji pereye cerdevantiyê bibin, dest bi provakasyonan kirin û carina bi leskefîn re, carina ji bi serê xwe êrîşî ser gundan kirin. Heta niha nêzîki 10 gundi, di êrîşen cerdevanan de hatine kuştin.

Roja 16'ê Gulân ji, cerdevanan gundê Girêcafera Kerboranê, êrîşê ser gundê Şemsî û Guharê kirin. Ev herdu gundî ji girêdayî Sîrtê ne. Cerdevanan gundê Girêcafer, bi hêzeke ji 50 kesi pêk haftî, pêşî gundan gullebaran dikin û dû re ji gundiyan dicivînin û bi qûndaxên tivingen xwe li gundiyan dixin. Cerdevan, malîn gundiyan ji talan dikin û hemû pereyê wan, ji wan distîn. Cerdevanan gundê Girêcafer, ji gundiya 3 kesi bi lêdanê dixin qomayê û bi xwe re dibin. Ev gundiyan ku bi birînen giran di destê cerdevanan de ne ev in: Ali Parlaker, Emin Tekes û Halîl Türkân.

Yek ji gundiyan ku ji cerdevanan lêdanê xwariye kalekî 65 salî Halîl Tunç e. Cerdevan bi awayêki hovane li Halîl Tunç didin û hemû pereyê wî jê distîn.

Li aliye din, gundiyan gundê Goveşîlê (Dihê) ji ber pesta cerdevan û leskefî, ji gundê xwe derdi kevin. Cerdevan û leskefî li ser rînşandana itîrafkar Suat Kaya êrîşî ser Goveşîlê kirin û gundiyan li navâ gund cîvandin. Cerdevan û leskefî, bi daran û qûndaxên tivingan li gundiyan xistin û dû re malîn wan talan kirin. Xwarin û qûtên gundiyan bi pîsiyan re tevi hev kirin. Serokê Cerdevanan Faruk Yilmaz

gundiyan bi kuştînê tehdît kir ku, gundê xwe biterikîn.

Li ser vê pesta cerdevan û leskefî, ji gundiyan Beşîr Özalp, Ömer Solgun, Abdullah Bahçeci, Emin Bahçeci, Ahmet Bahçeci, Ramazan Bahçeci, Beşîr Bahçeci, Ali Solgun, Saït Özalp, Cafer Baştas, Yusuf Bîşî û Ramazan Öner ji gundê xwe koç kirin û cûn li Dîhî bi cih bûn.

## JI NÛ VE KONTR-GERÎLA

Hêzên dewletê yên veşarî û tarî ji li ser kar in. Li Farqînê, li nêzî gundê Sûsayê, erebeyek ku nexweş dibir Diyarbekir ji aliye kesen "nenas" ve! hate gullebarankirin û 2 kes birîndar bûn. Ev kesen çekdar, li ser riya Farqîn û Diyarbekir dixwazin erebeyê bidin sekinandin. Şofêrê erebeyê ji ditirse û dixwaze bireve. Li ser vê, ev kesen bi çek, erebeyê gullebaran dikin û Munevver Gül û Neşat Toplu birîndar dibin. Şofêr bi gullebaranê re, bi lez erebeyê ji cihê bûyerê dûr dixîne û birîndar pêşî tîne Nexweşxanaya Farqînê, dû re ji ber xedarbûna birînen wan, wan dibin Diyarbekir.

Li aliye din gundiye bi navê xwe Mehrnet Akdemîr di kemîna cendirmeyan de birîndar bû. Mehmet Akdemîr, li Mezraya Qadîzkanê (Diyarbekir) dikeve

nava kemîna cendirmeyan û cendirmeye wî gullebaran dikin. Mehmet Akdemîr niha li Nexweşxanaya Diyarbekirê ye û birînen wî gelek giran in.

## PKK BI HEMÛ HÊZA XWE ŞERRAWESTINÊ DIPARÊZE

Serrawestina ku PKK'ê pêsi di 17'ê Adarê de ilan kir û dû re ji di 16'ê Nisanê de bişert û bêdawî dirêj kir, ji aliye hêzên PKK'ê ve, tevi hemû êrîşen dewletê, tê parastin. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, li ser mirina Turgut Özal da xuyan ku, heta Tirkîye ji vê rewşa nezel derkeve, dê şerrawestin bidome. Ev ji dide xuyan ku, PKK ji bo domandina şer hemû fersendan di de dewleta Tirk. Lî, dewlet heta niha bi tu awayî ji şerrawestinê ré nebûye alîkar û êrîşen ji bo imhakirinê domandîye. Kuştina 13 gerîlayen li Pasûrê ji, derbeyeke mezin li domandina şerrawestinê xistiye.

## HEYETÊ BIYANI JI BO ŞERRAWESTINÊ LI TIRKIYÊ NE


Her çiqas şerrawestin ji dewleta Tirk bersiveke xurt nestandibe ji, ji welatên dînyayê ji bo şerrawestinê destekkeke mezin heye. Hin ji van dewletan di van rojê dawî de, bi heyetên xwe serdanan li Tirkîye pêk tînin û desteka xwe ya ji bo şerrawestinê.

Ji Siwîsreyê (İsvec) heyeteke parlamente, ji Hollandayê ji di bin Serokatiya Serokwezir Ruud Lubbers de heyeteke parlamente û disa serokwezirê Almanya Helmut Kohl û tevi heye ta xwe, bi giranî ji bo domandina rewşa şerrawestinê li Tirkîye serdanen xwe didominin.


Wezirê Karên Derveyî Holandayê Peter Kooijmans, li Stenbolê di beyaneke xwe de wiha got: "Serrawestina PKK'ê ya yekali, li gorî me gaveke gelek baş û giřing e. Divê Tirkîye ji niha pê ve bi PKK'ê re be. Bila bi DEP'ê re bi kevin têkiliye."

Serdanen heyetên biyani, li sazî û komeleyen demokratik ji didomin.

Li aliye din, li Almanya cîgirê Serokê Parlementoya Rheinland-Pfaz Hans Gunter Heinz, di serdana Heyeta Belediya Hezoye de, ji şerrawestinê kîfxwesiyeñ xwe anî ziman û destekên xwe pêşkêş kir. Li Finlandiya ji komek zanyar, rewşenbir û niwêneren saziyên demokratik, destekên xwe ji bo şerrawestinê pêşkêş kir û li ser vê mijarê namayek ji Serokkomarê Tirkîye Süleyman Demirel re şandin.




Halîl Tunç, ji gundê Şemsî û kalekî 65 salî ye. Di êrîşen cerdevanan de lêdanê xwariye û hemû pereyê wî jê hatine standin.




Ferhat Kurtay



Mahmut Zengin



Necmi Öner



Eşref Anyik

# Çar leheng hatin bibîranîn

**Navenda Nûçeyan-** Çar leheng li bajarê Mêrdînê, Erzeromê û Amedê bi livbaziyeke korsan çar lehengan; Ferhat Kurtay, Necmî Öner, Eşref Anyik û Mahmut Zengin bi bîr anîn.

Çar leheng ên ku di 17'ê Gulana 1982'yan de ji bo rawestandina çespînên hovane yên Rêveberiya Girtîgeha Amedê xwe şewitandibûn, di salvegera livbaziya wan de hatin bibîranîn.

Li Erzeromê şagirtên Fakulteya Hêvotinê ku girêdayî Zanîngeha Erzeromê ye, li Mêrdînê şagirtên Dibistana Bilind a Meslekî ku girêdayî Zanîngeha Dîcleyê ye bi forumê û şagirtên liseyê yên

bajarê Amedê bi livbaziyeke korsan çar lehengan; Ferhat Kurtay, Necmî Öner, Eşref Anyik û Mahmut Zengin bi bîr anîn.

Di foruman de ji bo şehîdên şoreşê rawestina rîzdarîyê hate kirin, li ser kurtejiya wan hate axaftin, helbest hatin xwendin û slogan hatin avêtin.

Li Amedê, di livbaziya ciwanen liseyê ya ji bo bibîranîna çaran de ji, li Kolana Merga Ehmediyê livbaziyeke hate pê. Di livbaziye de sloganên wek "Şehîd nemir in", "Bijî ERNK", "Bijî PKK" hatin avêtin.

## Li zindanan serfiraziya girtiyan

**Navenda Nûçeyan-** Grevê birçibûnê yên ku ji aliye girtiyan siyasi ve nêziki 3 mehan hatin meşandin, bi serfiraziya girtiyan yek bi yek dawî li wan tê, girtî daxwazên xwe bi dest dixin.

Cara pêşî, li Girtîgeha Meletê girtî pişti berxwedana bi 2 mehan gihiştin mafên xwe û daxwazên xwe dan pejirandin. Dûre li Girtîgeha Diyarbekir pişti berxwedana bi 3 mehan, daxwazên girtiyan ku ji 18 madeyan pêk dihatin, ji aliye rêveberiya girtîgehê ve hat qebulkirin û dawî li greva birçibûnê hat. Niha ji, 300 girtî ji Girtîgeha Mêrdînê pişti 3 mehîn greva birçibûnê

mafên xwe bi dest xistin û dawî li grevê anîn.

Li gor peymana ku di nav girtiyan û Rêveberiya Girtîgeha Mêrdînê çebû, hemû mafên ku li Girtîgeha Diyarbekirê hatine dayîn, dê bidin girtiyan Girtîgeha Mêrdînê ji. Ev peyman bi navberiya Baroya Diyarbekir û KMM (İHD)'ê û bi hevditinên nûneren girtiyan û rêveberiya girtîgehê ve hate imzekirin. Li gorî peymanê, dê şertîn girtiyan di rojê de derbasî jîyanê bibin.

Bi vê peymanê re girtî, greva birçibûnê ya ku ev 3 meh e bi beşdariya 300 girtiyan ve didomandin, qedandin.

## Cizîrê Hakî Karer bi bîr anî

**Navenda Nûçeyan-** Hakî Karer di 18'ê Gulanê de li navçeya Cizîrê ji aliye gelê navçeyê ve, di salvegera kuştina wî de hate bibîranîn. Bi hezaran kes beşdari merasîma bîranînê bûn.

Internasyonalist Hakî Karer di roja salvegera kuştina wî de bi beşdariyeke mezin û çôşdar ve li taxên Cizîrê Cudi û Kurtuluşê hat bibîranîn. Merasîma bîranînê

heta derengiya şevê domiya.

Di dema merasîma bîranîna Hakî Karer de, berdevkekî ERNK'ê gelê beşdari merasîme bûbûn li hev civand û vê axafîtinê kir. "Hakî Karer mirovekî internasyonalist bû. Di gel ku Tirk bû, ji bo rizgarkirina gelê Kurd di refîn Têkoşîna Rizgarîya Neteweyî de pêşengiyê kirîye. Di 17'ê Gulana 1977'an de li Dilükê (Entebê) bi destê rîexistîna Stîrka Sor a hevkar ve hate kustin. Em wî li vir bi rîzdarî bi bir tînin. Hakî Karer şehîde PKK'ê yê yekemîn e.

Şehîdîn me nişanî me dane ku divê em çawa li ber xwe bîdin. Şehîdîn me yên 1977-78 ji civîna kongereya 1. re bûne sebeb û şehîdîn me yên 1979-80 ji li hember axayê komprador li ber xwe dane. Şehîdîn me yên 1981-82 şehîdîn berxwedanê ne. yên 1983-84'an bûne sebeb avakirina HRK'ê, yên 1985'an ji bûne sebeb ji avakirina ERNK'ê re şehîdbûna Egît ji damezirandina ARGK'ê bi xwe re ariye. Ango her şehîde Kurdistanê ji bo me

wate û maneyên cihê cihê tînin ziman."


### JI BO KAYPAKKAYA FORUM

İbrahim Kaypakkaya bi forumê li bajarê Stenbolê ji aliye şagirtên zanîngehan ve hate bibîranîn.

Di salvegera kuştina Kaypakkaya de nêzikî 100 ciwanen zanîngehê bi forumekê ew li Kampusa Zanîngeha Teknikî ya Stenbolê di 18'ê Gulanê de bi bîr anîn û qetilkirina wî protesto kirin. Di forumê de pankart hatin vegirtin û slogan hatin avêtin.

Piştî axaftina li ser girîngiya İbrahim Kaypakkaya ya di têkoşîna civakî de, govend ji aliye beşdaran ve hate girtin û stran hatin gotin.

İbrahim Kaypakkaya bîst sal berê di 18'ê Gulana 1973'yan de li Zindana Amedê bi işkençeyê hatibû kuştin. Piştî Dr. Hikmet Kivilcimli cara pêşîn ê ku rexneyen tûj li kemalîzmê girtibû ew bû.



Hakî Karer



İbrahim Kaypakkaya

## Mewlûda Uveys Öcalan

**Navenda Nûçeyan-** Mewlûda Uveys Esma Öcalan bi beşdariya gelek mebûs, rîvebirîn DEP'ê û gel ve hate xwendin. Hêzên dewletê ji bo ku kes zêde beşdari mewlûde nebin astengan derxistin.. li hinçetan geriyan, nasnameyan kontrol kirin, beşdaran kişandin kamerayê û gef li wan xwarin.

Mewlûda çilrojîya mirina Uveys Esma Öcalan, di 20'ê Gulanê de li ser wesiye ta wê li gundê Ömerî ya Xelfetiya Ruhayê, bi beşdariya 2 hezar kesi ve pêk hat.

Mebûsên HEP'ê Hatîp Dicle, Nîzamettin Toğuç, Mehmet Sîncar, Zübeyîr Aydar, Remzî Kartal, Serokê DEP'ê yê Mêrdînê Mehdi Aslan, endamên, Meclîsa Partiyê yên DEP'ê (Partiya Demokrasiyê) Muhsin Melik, Ferîdûn Yazar û gelek rîvebirîn rîexistinên DEP'ê beşdari mewlûde bûn.

Diya Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan û endamê Komiteya Navendî Osman Öcalan Uveys Esma Öcalan, di 11'ê Nisanê de li Mistîsî li bajarê Edenê çûbû ser diovaniya xwe.

# PÊNÛS

Amed Tigris



## Eqilê Kurdan ê pêşî û paşî

Dema ez li dibistana destpêkê şagirt bûm li navçeya me, li Licê gelekî Ermenî hebûn. Hesinger, terzî, goşkar, cil û paldırûnên naçeyê hemû Ermenî bûn. Ermeniyan ji tiryê rezên Waresinê, Korê û Panavê mey û şerâba herî tamdar çedikirin. Kurd nîkaribûn pînekê li cil û bergân xwe bixin, dasekê biseqînîn an jî tûj bikin. Senetê navçeyê bi tevî di destê Ermeniyan de bûn. Li dibistana, di pola (sinifa) min de jî çend hevlîn Ermenî hebûn. Ji wan hinekan zû bar kîrin û jî Licê cûn. Hinek jî heta erdheja Licê ya ku di sala 1975'an de çebû jî, hîn li wir bûn. Piştî erdhêje ew jî cûn. Ez bawer im ku, niha Ermeniyekî jî li navçeyê namaye. Xelkê navçeyê feodal û nezan, li Ermeniyan geleki tehde û eziyet dikir. Ji wan re alet û tiştan çedikirin, lê Kurdan destmiza wan nedidan an jî kêm didan. Bi filehtiyê ew biçûk diditîn. Di dibistana de jî dema dersa dîn dihat, mamosteyan şagirtên Ermenî dîkir der. Digotin ew kafir in. Bi moraleke xerab ji dersê derdiketin û diçûn der. Wê demê di nav me de jî sarbûnek çedibû. Em zarok bûn, paşê me ji bîr dîkir. Me dest bi ders û listikan dîkir.

Di salên 1970'yan de dema ez bûm mameste û dişa bi paş ve hatim Licê, ji malbatêne hevalen min yek jî nema bû, hemû ji ser axa bav û kalên xwe bar kiribûn û çûbûn. Bi tenê çend kesen hesinger mabûn. Wê demê li herêma me xortan dest bi şoşergeriyê kiribû. Her ku diçû hejmara şoşergeran zêde dibû. Li çayxane û meydanan semîner û civînen curbecur çedikirin. Gelek kes dihatin guhdariya civîn û semîneran.

**Karekterê me Kurdan yek jî ew e. berî ku em baş bifikirin, ji her aliyi ve li bûyerê û dozê mêze bikin, em pêşî qerarê xwe didin. Pêşî qerardayîn ne rast e. Bi xwe re zerarên mezin û giran tîne. Di laşê me de kul û birînên giran vedikin. Dîroka me ya siyasi bi van mînakên berbiçav tije ye.**

Ez qet ji bîr nakim, di semînerekê de ji wan kalemîre Ermenî yekî heqê axaftinê xwest û wiha dest bi axaftina xwe kir. —Em Ermenî dibêjin eqilê Kurdan dido ne. È pêşî û paşî. Kurdan heta niha ji ber eqilê xwe yê pêşî wîndâ kirine. Cara pêşî Kurd nafikirin û hema di cih de qerarê xwe didin. Ji ber ku nafikirin û qerarê xwe didin û wîndâ dîkin. Paşê poşman dîbin. Lî xorten nû divê wek bav û kalên xwe, gotina eqilê xwe yê pêşî nekin. Baş bifikirin û gotina eqilê xwê yê paşî bikin. Bav û kalên we sofi bûn. Sofiyê xelkê bûn. Mala xwe û me tev şewitandin. Heger wan bi eqilê xwe yê paşî bikirina, me dê dest bidana hevdu. Heta Romê mala me wêran dîkir û dişewitandin, me dê mala wan bişewitanda. Axxx ez ci bikim, êdi ji min cû, ez kal im. Xwezî hûn xort di dema bav û kalên xwe de derbiketana. Wê çaxê dê mîran ji xwe re biditana. Niha di vê demê de tu xorten me jî li ser axa xwe nemane. Welat vala bû.... Berê mezinê we ji me re digotin "kirîv" û me jî, ji wan re digotin "kirîv". Niha em bûne "pîsmam, xal û heval"

Bî ditina min, tespiîta kalemîre Ermenî an jî tespiîta Ermeniyan a li ser Kurdan, tespiîtekî rast e û di cihê xwe de ye. Karakterê me Kurdan yek jî ew e. berî ku em baş bifikirin, ji her aliyi ve li bûyerê û dozê mêze bikin, em pêşî qerarê xwe didin. Pêşî qerardayîn ne rast e. Bi xwe re zerarên mezin û giran tîne. Di laşê me de kul û birînên giran vedikin. Dîroka me ya siyasi bi van mînakên berbiçav tije ye. Em qet ders û tecrûbe ji wan dernaxin. Ew şerê ku di navbera hêzên Yekîtiya Niştiman, Partiya Demokrat a Kurdistana İraqê û PKK'ê de derket çibû? Heger herdu alî jî baş bifikiriyana ev şer dernediket. Heta eqilê pêşî hat, yê paşî mala Kurdan şewitand. 3-4 hezar pêşmîre ji kîsê dê û bavên xwe cûn! Hin berî ku şer dest pê bike min di vî quncikê de bi sernivîsara "Stop ji şerê birakujîye re" nivîsarek nivîsi. Min digot ku "Encama şer ci dibe bila bibe, di dawî dijminê gelê Kurd qezenc dîke." weha jî bû. Di dawî de rejîmînê İraq, Türkiye, İran û Suriyê qezenc kirin. Do Tirkan êrîş dîbir ser Başûr iro jî İran. Ne dûri eqilê eku beyanî (sibehê) her çar dewletên dagîrker bi hevdu re êrîş bibe. Do birin ser Başûr, iro dîbin ser Rojhîlat û Başûr û beyanî jî bibin ser Bakûr an jî parçeyekê din.

# Nivîskar û nivîsandin

## Serefjan Cizîri

Hejmara kesen nivîskar li welatê me pir kêm in. Kesen ku bikar in û bi nivîskariyê dadikevin dikarin bi tiliyên destan bêne hejmartin. Weke meslek nivîskarı li Kurdistanê pêş neketî. Ev realiteya civakî bi xwe re pirsgirêke kulturî û politîk peyde dike. Weke tê zanîn nivîskar û nivîsandin, yekbûna ziman û hişmendîyeke kulturî çedikin û alîkarî dike ku mirov hevdu baş fêm bike. Nivîsandin karekî pratîk e. Pratîka nivîsandin alyariya mirovan dike ku xwe û xelkê xwe nas bikin. Bi naskirin hişmendî pêş dikeve û hişmendî jî alîkarî dike ku, mirov xwe nas bikin. Danûstandinê bi rekûpek, bi alîkariya nivîsandinê pêş dikevin. Bi qûrqûra beqan û qeqeba kewan danûstandinê kûr û bi mana pêk nayê. Ji ber vê yekê jî divê nivîskar û nivîsandin li Kurdistanê bi maddî û manevî bê teşwîqkirin. Mirov me divê ji hev re alîkar bin. Bi hesûdiyê û zikreşiyê mirov nagîhê tu armancê. Di roja iro de divê Kurd, ji hemû neteweyan zêdetir hevkari û dilpaqîjîye di navbera xwe de bidin rûniştandin. Weke helbestvanê mezin **Ehmedê Xanî** dibêje: "Heger hebûna ittîfîq me", ew rewşa xelkê Kurd ne hevqasî tehl û dramatîk bû...

## KÊMBÛNA NIVÎSKARAN TALÜKE YE!

Kêmbûna hejmara nivîskaran li welatê me bi xwe re hinek talûke jî derdixe pêş. Ev tiştîkî pir vekirî ye. Tunebûn an jî kêmbûna hinek tişt û meslekan dikare bi xwe re hinek nexweşîyan peyde bike. Ev nexweşî dikarin bi hîsanî bibin alîkar ji bo pêkhatina berhemên nîzim û qelsiya nivîskar û nivîsandinê. Ev rastiya sosyolojik di hemû rewşa civakî de wiha ye. Pêkhatina kategorîya meslekî bi awayekî sosyolojik bi tevayî bi civakî ve girêdayî ye. Jixwe yek ji hîmî medeniyetê ew e ku. Hejmara meslekan zêde bibe û profesionalizm di civakî de belav bibe. Bi gotineke din: heger hemû kes karîn xwe baş bizanîn wê tevlîhevî û sergêjahî jî kâm bibin.

Di meha Nîsanê de bi navê "Rola edebiyatî di pêşketina civatê de ci ye?", panelek (civînek) li ser rewşa nivîskariyê û edebiyata Kurdi, ji aliye Yekîtiya Rewşenbîren Welatparêzen Kurdistanê li Swêd, li Stockholmê hatibû organîzîkerin. Di panelê de lêkolînger Rohat, nivîskar û berpirsiyare kovara Nûdem Fîrat Cewerî, helbestvan Mahfuz Mayî û nivîskar Mehmet Uzun besdar bûn. Min jî civîn idare dikir. Di civîn de hinek pîrs û pirsgirêken bi giştî li ser edebiyat û taybetî edebiyata Kurdi, hatin munâqâsekerin û zibil, ji hejmara nivîsarê nêkirkêr û zibil sedqat zêdetir e? Ma gelo hewce ye ku mirov di vî warî de li halê muzîka Kurdi bipirse û hwd?

Di van demê dawî de tiştîkî bala min pirr dikişîne. Kurdan iça dest pê kiriye ye sîc û qelsiya xwe, dikin malê marksîzmê. Ev i-diayekê pûc û vala ye. Weke Kurden me yê Soran dibêjin: "Ev kisayê qor e." Wexta ku nivîskar

nînan û ji romanen bigir heta cîrokan, hemû tiştî ku nivîsandî ye, dike literatur. Di literaturê de xalê pirr girîng ziman û mijar e. Ez li vê naxwazim munâqâse li ser ti-xubê (hidûdê) di navbera literatur û sosyolojî an ji literatur û xebatê ilmî yên curbecur de, bikim. Ev mijareke pirr fireh û kûr e. Lê li vê ezê literatur di maneya klasik de bikar bînim. Formen vê literaturê çîrok, roman, helbest, gotinîn pêşyan, bîranîn, biyografi û jiyanî nivîskaran bi xwe ye. Ev jî, weke tê zanîn bes beşeka literatur ê pêk tînin.

## TESÎRA KULTURA DÎNÎ

Di nav van formen literaturê de evê herî pêşketî li Kurdistanê helbest e. Di vî warî de literaturê de dewlemend û klasik li Kurdistanê heye. Kultura dînî tesîreke mezin li helbestvaniya Kurdi kiriye. Pirraniya helbestan, di dîroka helbestvaniya Kurdi de, bi awayî qasîde hatine nivîsandin. Qasîde ji weke tê zanîn, ji Ereban derbasi nav Kurdan bûye. Di dema xwe de qasîde di literatura me de, xwedîyê cihêki bi taybetî bû. Mijara qasîde evîna dînî ye û din jî di xizmeta serdestan de ye. Nivîskarê qasîde jî mele bûn. Di qasîdeyan de pirr fîkrîn dînî hebûn û ev qasîde dikarin weke kanya dîrokî ya fîkrî li welatê me jî bîn bikaranîn. Form û naveroka qasîde bi awayekî pirralî hevûdu temam dikarin. Ma gelo mirov iro dikare, bêqerf qasîde li ser proletarya bibêje? Literatura ku proletarya û sosyalizmê ji xwe re bike mijar, divê dev ji qasîde berde? Formen qasîde ya dema xwe temamkirîne? Ji helbestvaniya Kurdi re formen nû pêwist in?

Dîroka roman û çîroka Kurdi pirr kin e. Berhem jî di vî warî de pirr hindik in. Hema hema mirov dikare bibêje ku, berhem di vî warî de tune ne. Hebûna hinek roman û çîroka vê rastiya kulturî zêde naguherîne. Weke bav û kalê me jî dibêjin; bi çend gulan bihar nayê. Ev valahiya ku heyek zû bi zû jî nayê dagirtin. Ji ber vê yekê jî divê Kurd mirovên xwe bi hemû awayî teşwîki nivîsandinê bikin. Ev pêwistbûneke dîrokî ye. Heta ku di warê literaturê de lehî li welatê me ranebe, berhem bi rekûpek çenebin. Di vê mijarê de rastiyeke dîrokî jî heye: Di navbera lehiyê de zibil, qîş, qerş û mers pirr hene. Ev rastiya hanê de pirr warê din de jî wisa ye. Ma gelo di navbera politîkvanê Kurdan de, zibil, qîş, qerş û mers tune ne? Di jiyanî politîk a civaka Kurdi de, hejmara politîkvanê nêkirkêr û zibil, ji hejmara nivîsarê nêkirkêr û zibil sedqat zêdetir e? Ma gelo hewce ye ku mirov di vî warî de li halê muzîka Kurdi bipirse û hwd?

Di van demê dawî de tiştîkî bala min pirr dikişîne. Kurdan iça dest pê kiriye ye sîc û qelsiya xwe, dikin malê marksîzmê. Ev i-diayekê pûc û vala ye. Weke Kurden me yê Soran dibêjin: "Ev kisayê qor e." Wexta ku nivîskar

û rewşenbîren me qelsî û kêmâsiyên literatura Kurdi li welat, bi hebûn û xurtbûna marksîzmê ve girê bidin, wê neheqîyeke pirr mezin bikin. Li gorî van kesan marksîzm di welat de li diji pêşketîna kultur û literaturê sekiniye, parti û rêxistinê me hergav daxwaz kirine ku nivîskar û rewşenbîrê welat karên politîk bikin. Ji ber vê yekê jî nivîskar û rewşenbîrî li Kurdistan mecal nedîtiye ku berhemê hêja biafirne... û hwd. Weke ku min li jor jî got ev kisayê qor e! Beriya hemû tiştî ez dixwazim bibêjim, ku ev dîtina hanê ji bingeh ve çewt û vel e. Di rastiya xwe de pirr nivîskar û rewşenbîrîn dema me di dibistana marksîzm re derbas bûne. Ew bi xêra marksîzm û kultura sosyalistî bûne xwedî tiştî. Neteweperestîya Kurdi û liberalizma teqlid di vî warî de ne xwedîyê tu berhemê xuyayı ye.

## POLÎTÎKA Û KULTUR

Polîtîka, divê li ser kulturê ava bibe. Kultura divê bibe bingeha polîtîkayê. Ji ber ku kultur beriya polîtîkayê heye. Mirov dikare bêyi mubalexe bibêje: polîtîkayekê békultur weke xwarineke bêtahm e û kultureke bêpolîtîka ji weke zadekî neçandî ye. Bi kurtasi divê kultur û polîtîka bi hev re bimesin. Mirov dikare vê yekê di jiyanî Marks de bi hêsanî bibîne. Marks ji nêzakayî ve bi problemen kultur û edebiyatê dadiket. Li gorî zavayê wî **Paul Lafargue**, Marks pirr cara di sohbetên xwe de ji xebata hozan û nivîsaran mînak didan. Ji hemû literatura Ewrûpayî Marks roman, çîrok û helbest dixwendin. Her zimaneki bîyanî weke cekeki di xizmeta jiyanê de didit. Bi hemû zimanê Ewrûpayî dikaribû bixwenda û bi **Elmanî, Ingilizî** û bi **Fransizi** ji dikaribû binivîsanda. Hozanê Grekî yê mezin **Aiskylos**, Marks bi zimanê orjinal her sal dixwend. Hozanê mezin Goethe û nivîskarê navdar **Shakespeare** ji ezber zanibû, ifadeyên tipik ku di dramê Shakespeare de hebûn Marks hergav bi kar dianîn. Nivîskarê hemîdem weke **Alexander Dumas, Walter Scott** û **Balzak** û gelekî din. Marks ew hergav bi evîn û kêt dixwend... û hwd. Marksistan bi awayekî pirralî li hemû cîhanê, ilmî edebiyat û kulturê pêşve xistîne. Problem di vir de ne problemen marksîzm ne, problem ze xeliya nivîskar û rewşenbîrê Kurdan e. Kesê ku wexte xwe vala derbas dîkin û weke kewê ribat li vi ali û wi ali dixwîn, bila bi xêra xwe û ji kerema xwe re ji gazinan ji marksîzm nekin! Beriya hemû tiştî divê gazinan mirovan ji mirovan bi xwe be. Ji ber vê yekê jî ez pirr cara dibêjim: xwe nas bikin. Kurd divê xwe nas bikin da ku em karibin problemen xwe nas bikin û problemen xwe ji nas bikin da ku em karibin wan çareser bikin! Em di vê xebatê de nikarin li ben-

da Godot bisokin!

# Di çanda Kurdî ya gelêrî de kilamên keçikan

(2)

4. Figurên li ser evîniyê û dîtin û ramanên keça Kurd:

Bê te got hacê li min hacê  
Kul ketiye koka Dara Qerexacê  
Bê kêt nabeyna her dilan,  
her çavan xeber bide  
Xwedê bikuje kurê wanê berzewacê.

Bê, ciya re neçe, ciya hênik e  
Pêl gulê neke, gul tenik e  
Bê wisa bike bira kes nifiran  
Li mexsed û mirazê min û te neke.

Bê gede dike ji vir here  
Dara destê xwe digere  
Dike silavekê bide min  
Kelogirî, dev nagere.

5. Figurên sirûstê yêñ ajala û lêñerîna keça Kurd li ser bûyeran:

Mîrîka spî maka kurkan  
Gede lawik derket ji mehella Tirkan  
Qapût xwe kir, xwe fîrikand  
Heyfa min nayê tu heyfê  
Xelkê axatî teze kir  
Vî axatî terikand.

Bê ci civîka nukul zer e  
Baz da piş tûma kerengzer e  
Derdê dila wisa zor e

Li ser derdê vê cigerê.

Bê ciyawo, ciya mersîlo  
Bê giya rabû, bû xesîlo  
Bê qet kesî dîtiye miro  
Birindirekî biavêje  
Ber beranê qert ï pîro.

Bê ewrê şayî li hendeqa  
Gola Wanê cot werdeka  
Yek Ahmedê por heleq e  
Yek Fatoya çavbelek e.

6. Li ser axa û began dîtin û ramanên keç û xortêñ Kurd:

Hîva gundê me çakîl e  
Axayê gundê me cahîl e  
Belkî kurê wî bimire  
Xwe daye bazara bêdil e.

Bê me zozanê we çêrandin  
We zozanê me çêrandin  
Xanberindîra daw gerandin  
Keçen axa çiqas rind in, em helandin.

Bi min kulam, bi min kulam  
Mala gede derket çola Zîlan  
Ezê nizam kîjan axa, kîjan xulam.

7. Sitemên keça Kurd li ser jiyana ku tê serê wan:

Ez genimê sor ï Biharê me  
Min neçinin ez gune me  
Ez di destê xelqê de  
Sed zérê Reşadi me  
Ez ji te re bêpere û bêpolo me.

Bê ewrê şayî fena text e  
Kurê apê çiqas bêbext e  
Îşev du şev e çûye  
Welatê xerîbê xerîbistanê  
Ji min wetrê salewext e.

Rasta Evdal Axa cîkî dêm e  
Ez kulîlka devê re me  
Xîncî Xwedê; pêxemberan  
Kes nizane ez qismeta lawê kî me.

8. Xortêñ Kurd ji bo keça Kurd daxwazî û sitemên xwe wiha tîne ziman:

Bê keçik dînê meçe çiyê, melûl nebe  
Bira şehra serê te ba nebe  
Eger dilê teyê di min de hebe  
Bira per û baskê Xwedê, pêxemberan  
Li ser te be  
Eger dilê teyê di min de tune be  
Bira qedera te serê Dara Qereaxacê be  
Qe venebe.

Bê keçikê dilê min du cî ye  
Yek li vir a yek li ciya

Ya ciya tehjî, tu li pey qerici  
Ya vir a tu dibê qey  
Çaya li ser destê Qaweciya.

Min digot kanya gundê me mermer e  
Min digot kanya gundê me mermer e  
Qîz bûkan xwe dayî sere  
Heft xweziya min bi wî hatî  
Navê hezkiriyêñ wan Qemer e.

9. Di van kilaman de navêñ ciya, gund û bajaran derbas dibin. Hinek ciyên dîrokî û bi nav û deng xwe di van kilaman de beyan dîkin. Çend mînak:

Bê Axedeve hise his e  
Kûpqiran wêde Qerekilis e  
Mizgîn ciya mîzgîna xêrê da min  
Got gede lawikê te bûye  
Başhekîmê Serreisa.

Got ji Qersê heta Qersê  
Solê kuta nelçâ mesê  
Heçî kesê bi me xeber de  
Xwedê bikuje kurê wanê berzewacê.

Bê te çav reşes keriye kila  
Min dihejmart sî û sê gulî  
Li nava milan  
Gede de tu were min birevîne here  
Biavêje Aşqeleshê dêra filan.

# Konsera Koma Lorî îptal kîrin

**Koma Lorî ji Nahçivanê bi hêviyêñ mezin ku dê dikaribin li welatê xwe bi serbestî bistrêñ û hunerên xwe pêşkêşî birayêñ xwe yêñ bakur bikin, hatibûn Qers û Agirî. Lê tevî ku ji bo konserê destûr ji walî standibûn jî, konserên wan hatin îptalkirin.**

Ev koma hanê li Nahçivanê çalakiyêñ xwe dimeşîne. Kom ji deh kesenê Kurd ava bûye. Konserên xwe bi deh ziman dide. Ta iro li nêzî deh dewletan konser dane û bala pirr rojname û kovaran kişandine. Piraniya bes-teyêñ ku dîbêjin ên wan bi xwe ne.

Koma Lorî wan rojêñ ku derbas bû ji bo ku konserê bidin hatin Agirî. Berî li Agiriyê konserê bidin, li Sarıkamişê li alaya cenderma konserek dan. Li ser vê berpirsayarê komê Hesenof: "Li alayê ji bo ku em bi Kurdi bistrêñ, pirr daxwaz ji me re hatin û em nêzî du seitan bi Kurdi li hundirê alayê stran û kesî ji me re negot çima hûn bi Kurdi

distirêñ!" Hesenof, armanca komê bi rengê neteweyî û xwedî derketina çanda Kurdi datanî holê û wiha dom dikir: "Navê koma me ji bingeha muzîka Kurdi tê. Gava dayikêñ me zarokêñ xwe dixin xewê lorîkan ji wan rê dibêjin. Me navê xwe ji we lorîyê standiye".

Piştî konsera alaya Sarıkamişê Koma Lorî xwest ku konserên xwe li Agirî û Qersê jî bidin. Ji bo ku karibin konserên xwe bidin, ji Waliyê Agiriyê destûr standin. Lê roja konserê, emniyetê destûr neda konserê.

Hesenof: "Ev ci kar e, min tişt jê fêm nekir? Wali destûrê dide, emniyet vê destûrê radiwestine. Ev, vê rastiyê şanî me



Koma Lorî, ji hunermend û muzîkvanê ji Nahçivanê pêk hatîye û bi deh ziman distîren.

dide: Li Tirkîyê, ferman ji jér ve dest pê dike, emniyet li wîlayetê guhdar na-ke, ev jî bingeha hebûna diktatoriyê ye". Bi her a-wayî xuya dikir kom ji vê gera xwe ne kîfxweş bû. Ta iro li gera xwe yî li welatê dinê sererastî tiştekî wiha nebûbûn û digotin

em herin kîjan deverê emê vê rewşa Kurdistanê dibêjin.

Ji ber Ku destûr nedan konsera wan. Ji bêpere-bûnê niha nikarin vegerin welatê xwe jî, kes li wan xwedî derneketinê jî, kom bi gazin e. Lê berpirsiyarê komê Hesenof: "Tu as-

tengî nikare me rawsetîne, emê xebatén xwe dom bikin, emê stranên xwe dîsa bi zimanê Kurdi, Tirkî, Rûsi, Azerî, Tirkmenî, Kazakî, Özbekî, Fârisî, Gürçî û hwd. bibêjin. Koma me komek inter-nasyonalî ye. Emê gera xwe jî dom bikin." digot.

Pirr ji evîna te biryan im  
 Dil bi agir, cîger bi kovan im  
 Evîndarê te me, welat im, can im  
 Kurdistan im, Kurdistan im, Kurdistan im  
 Ev çend sal in, perîşan im, sergerdan im  
 Ev çend sal in di bin destê Ecem de  
 Di bin şûrê Ereb de  
 Li bin pença Tirkân im  
 Na!....Na!...  
 Ne termeki bêgîyan im  
 Tenê tu zendên min derxe ji vê zincîra koletiyê  
 Tê bibînî  
 Ci cengewar im, ci şervan im  
 Ci sergevaz im, ci qehreman im.


Ez qurmê dîroka cîhan im  
 Hêñ dayîka Somer  
 Zarokêñ xwe bi min dixistin xew  
 Ma tu nizanî?  
 Ez kurê Goto me, kurê Lolo me  
 Kurê Horo me, kurê Mîtan im  
 Ez torinê Mad im, bi xeml û xêzên giran im  
 Ez avakirê wan kavilêñ Ekbetan im  
 Kawayê Hesinkar im  
 Dijminê zordar im  
 Agirê azadiya gelan im  
 Hêñ ji zindî me, xwedî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

Zerdeşt im  
 Ronahî perest im  
 Li hember tariyê  
 Roja li ezman im  
 Manî me, danayê şîret û pendan im  
 Erdeşer im, Rustem im, Noşîwan im  
 Bi rim im, bi şûr im, bi mortal im  
 Bi xençer im, bi şîf im, bi pal im  
 Bi zirx im, bi gurz im, bi qelqan im  
 Rûberî lekêñ leşkerê Rom im  
 Li meydan û kiradê  
 Ci pehlewan im, ci qehreman im  
 Hêñ ji zindî me, xwedî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

Ez im ew Kurdê bi nav û deng  
 Ez im Kardoxê bi tîr û xedeng  
 Di ser min re borîn  
 Pirr çax, pirr dem, pirr heyam û beng  
 Li ser sîngê min  
 Her çax û her sal, her roj û her gav  
 Èriş û talan, her şer û her ceng  
 Min dîtin pirr roj  
 Min dîtin pirr şev  
 Ev demen zêrîn, ew rojêñ pirr teng  
 Èrişen Ereb, talanêñ Megol  
 Ji Rom, ji Fireng  
 Ez mam li meydan, nebûm pereng-pereng  
 Hêñ ji zindî me, xwedî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

Ez siwarê Rojhîlat im  
 Parêzkarê birc û kelat im  
 Sérkohê cengewar im  
 Spahsalar im, îsfahsalar im  
 Li hember Filip û Rîsar im  
 Selahedîn im, li ser xana zîn im  
 Qehremanê Hetîn im  
 Rîzgarkirê Quds û Felestîn im  
 Her serfiraz im, ci sultan im  
 Adil im, Zahir im, Tûran im  
 Ez bi tacâ zêrîn im  
 Li Amed û Farqîn im  
 Li ser textê Merwan im  
 Ehmedê Dehak im, siwarê bi tîn im  
 Genaralê Romê ji xana zîn diqlubînim  
 Çerxa dîrokê vedigerînim  
 Herdem zindî me, xwedî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

# Serfirazî



## XAMEVAN

Ez im, ji van çiyan re nav û nîşan im  
 Ez pilingê Xerzan im, şerê Botan im  
 Bazê Behdînan im, ejderê Soran im  
 Ez şahînê Erdelan û Baban im  
 Canpolatî me, mîrê Mand im  
 Ez im, li kela Dumdumê Mîrxan im  
 Dewrêşê Evdî me, bu diwanzdeh siwaran  
 Li hember hezar û hefsed siwaran Gîsan û Tirkân im  
 Hêñ ji zindî me, tîjî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

Ez Herînî me, Cizîrî me  
 Feqî me, Nali me, Xanî me  
 Hejar im, Hêmen im, Goran im  
 Biwêj im, şekerrêj im  
 Ez xweş dibêjim, her torevan im  
 Fehlemez im, awazciwan im  
 Li rûpelên dîrokê binêre!  
 Herdem nazikziman im  
 Ez xwedî nirxên bilind im  
 Demîn û sinciyêñ giran im  
 Ez ji welatê evîn im  
 Ferhad im, Şerîn im  
 Xec im, Siyamend im  
 Zîn im, Memê Alan im  
 Hêñ ji zindî me, tîjî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

Ez xêr û bêra germiyan im  
 Ez av û berfa ji zozan im  
 Petrol im  
 Dibim agir, dikim gurgur  
 Kermanşah im, Kerkük im,  
 Batman im, Rimêlan im  
 Ez qêrina keçan û bûkan li Gelyê Zilan im  
 Hawara mindalan li Kela Dizan im  
 Ez loriya dayîkê, axîna bavê kal,  
 Nalîna zarakan li Helebçeya xopan im  
 Disan zindî me, xwedî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

Ez duhî li Diyarbekrê Şêx Seîd bûm  
 Li Dêrsimê Seyid Riza bûm  
 Li Mehabadê Qazî bûm  
 İro ji li zindanêñ Amêdê.  
 Xeyrî me, Kemal im, Akîf im, Çîcek im,  
 Doğan im, Doğan im Doğan im  
 Ez di qada şer de Bêrivan im  
 Mizgîna leheng im, li kolanêñ Tetwan im  
 Ez di şer de ci Egît im, ci komîtan im  
 Serbazê nenas im.  
 Li ser her bihosteke axa niştiman im  
 Birêre ey dîroka cîhan!  
 Herdem zindî me, tîjî jiyan im  
 Kurd im, nemird im, torinê wan im.

# Qaseta Sî û Sê Gulle û nûjentî

Zana Farqînî

Her şoreş hunera xwe bi xwe re tîne, diafirîne. Ev tespît-heta niha hatiye pejirandin û hîn jî tê pejirandin. Jixwe ev tespît ji bûyer û qewimandinê civakî, siyasi hatiye derketin. İro em jî vê rewşê dijîn. Di wî warî de xebat têne kirin, berhem têne afirandin û gengeşî, gotebêje li ser huner, wêje û hwd. têne kîrin.

Êş û janêne me yêne li ser vî warî, hîn pîr in. Berhemê hemdem û gerdûnî ku em pêşkêsi raya giştî ya dînyayê bikin hema hema qet nîn in. Divê ev rewş neyê jibîrkirin û ji pişt guh re neyê avêtin.

Di tevgera huneri de ez dixwazim li ser çalakiyên muzîki rawsetim. Bi bilindbûna tevgera azadî û rizgariya welat re di vî warî de jî hîn pêşveçün çebûn. Komên muzîkê hatin avakirin, dengbêj û starbêj der-

encam neyînî ye.

Vêca di navbera berhem û daxuyaniyên ew kesen huner-mend ên muzîkê-tevî kom û kesan de nakokiyek, dubendi-yek heye. Yanî pirêze û gotinê wan li dijî hev in. Tev dibêjin ku muzîka Kurdî ya hemdem, nûjen û gerdûnî çedîkin. Tu kes hema hema nabêje ku bi form û rîtmîn biyanî bi awayekî sentezî ez (an jî em) muzîka Kurdî ya nûjen çedîkim (n).

Li gorî min beriya her tiştî divê têgînên (terîmîn) nûjen, hemdem û gerdûnî bêne diyar-kirin. Di naveroka van têgînan de ci heye, ci veşarî ye an jî ev kes û kom ci wateyê (maneyê) dixin têgînan divê bê eşkerekirin. Naverok bê zelalkirin.

Dîsa jî divê mirov bi çavê ku kes û kom xwe çawa didine nasînê li wan binêr û binirxîne. Ger kes an jî kom xwe bi awayekî çêkerê muzîka gelêri û o-

Kurdî ya hemdem û gerdûnî dûr e. Em nikarin xebatê wî tevî vê qaseta wî wekî muzîka Kurdî ya nûjen binirxînin. Ji ber ku ew senteza muzîka Kurdî çedîke.

Ev qaseta wî jî, hem ji aliyê bikaranîna amûrê (enstrûmanen) muzîkê ve û hem jî, ji aliyê teşe, rîtim, melodi û pîvanan ve xwerû ne Kurdî ye. Senteza muzîka Kurdî û Ewrû-pî ye. Di hin parçeyên xwe de em dikarin bibêjim ku guyana muzîka Kurdî ya hemdem qefaltiye. Anglo li ser taybetiyê muzîka Kurdî parçeyên xwe afirandiye. Mîna parçeyên "Tu Ciwan î" û "Diyarbekir". Lî parçeyên din ne wisân in. Di wan de bêhn û tama rock, pop û cazê û hwd. xwe bi hêsanî dide der. Guhdar zû bi vê biyanîbûnê dihese. Ev jî heye ku tembûr, mey, ney û flût car carina biyanîtiyê ji navê radike û nasbûna xwe bi bîra guhdaran



Ev cara yekemin e ku qaseta Ciwan Haco li piyasa Kurdistanê û Tirkîye bi serbestî tê belavkirin. Li jorê Ciwan Haco û li aliyê rastê ji berga qaseta wî ya bi navê "Sî û Sê Gulle" tê ditin.

ketin holê. Êdi qaseten bi Kur-dî li qirikene. Guhdar mîna berê nabêje bila Kurdi be ci di-be bila bibe. Bi çavekî rexengîr û bijarî lê dinêre. Li gorî bir û baweriya xwe ji xwe re qaset dîneqîne.

Lê belê di piyaseya muzîkê de tevlîheviyek, aloziyek heye. Bi pirranî kesen ku distrêne ji aliyê muzîkê vê nehatine hévo-tin. Hinek denxwes in ewqas. Bes bi dengxweşîye muzîkeke hemdem û nûjen nayê çêkirin û afirandin. Çawa divê romana şoreşê bê nivisin, wisa pêdivî bi muzîka şoresê re jî heye. Dema em bi van pîvanan ber bi muzîka Kurdi ve herin û binirxînin, cihê mixabinê ye ku

tontîk dabe nasîn, divê rexne di vê çarçoveyê de be.

Tevlîhevi û gelemse di warê muzîka hemdem, nûjen de heye. Her gel, netewe ji aliyê muzîkê ve xwedîyê taybetiyen e. Pîvan, rîtim, teşe (form), melodi, armonî û heta dengê navber (koma) taybetiyen heri girîngin. Mînak di muzîka Ewrû-pî de dengê navber angó koma nîn e. Lî di muzîka Kur-di de heye. Ji aliyê din ve di hin meqamên Kurdi de wek hî-caz dengê navber nîn e.

Heke em li gorî tespîtên jorê li qaseta Sî û Sê Gulle ya Ciwan Haco binêrin û tevî xebatê wî yêne din, em dê bibînin ku bi temamî ji muzîka

dixe.

Qaseta Sî û Sê Gullê ji aliyê naverokê ve ji demê ne dûr e. Bersiva demê dide û nave-rokên parçeyan xurt in.

Di bergê qasete de nivîsanda parçeyan tiştîkî bas e. Lî mixabin ku çewtiyên rîzimanî û rastnivîsê gelek in. Dixuyê ku ji aliyê kesek ne pîsporê zîmam ve hatiye amadekirin. Heta navê qasete jî bi çewti hatiye nivîsin.

Di gel her tiştî xebatê wiha bi wêrekî girîng in. Tu tişt di şûna xwe de namîne û diguhe-re. Dîvê em çeperan li dora xwe neafirinîn û wan li xwe teng nekin. Lî her xebat divê bi zanebûn werine kîrin.



# AZADÎ

Abdurrahman Durre



## Suleyman û Kamîran

**K**amîran pozqotan e, Demîrel zikheban e/ Suleyman Anadolî ye, Kamîran ana tolî ye/ Suleyman xerbî ye, Kamîran şerqî ye/ Demîrel bêxêr e, Kamîran bêkêr e/ Suleyman bêpîr e, Kamîran hêşir e/ Suleyman qelew e, Kamîran cedew e/ Suleyman faşo ye, Kamîran kaşo ye/ Suleyman melez e, Kamîran bêwez e.

Herdu jî kemalist in, herdu jî kelmîst in/ Herdu jî patron in, li dijî gelan in, herdu jî mason in, derd û bella ne/ Herdu jî zirek in, herdu jî pîrek in/ Herdu jî qurnaz in, herdu jî cambaz in.

Kamîran Kurd e, Demîrel Qurd e/ Kamîran diplomat e, Suleyman şilo-şaht e/ Demîrel qesil e, Kamîran esîl e/ Kamîran cidî ye, Demîrel gidî ye/ Suleyman bêsoz e, Kamîran bêdoz e/ Suleyman bipişt e, Kamîran bêtişt e/ Suleyman dexes e, Kamîran bêkes e,

Suleyman aza ye, Kamîran raza ye/ Suleyman serbest e, Kamîran derdest e/ Suleyman bêyom e, Kamîran bêdom e/ Suleyman rûvî ye, Kamîran kûvî ye/ Suleyman masî ye, Kamîran dasî ye/ Suleyman çavşor e, Kamîran çavkor e/ Suleyman bêqeys e, Kamîran bêkeys e/ Demîrel rojfelatî ye, Kamîran rojhîlatî ye/ Kamîran Ûartûyiye, Demirel İspartî ye.

Herdu jî wek hev in, herdu jî wek şev in/ Ne mîr û mîrxas in, ne kîr û ne das in/ Ne şîr û pîling in, ne qaz û quling in/ Herdu jî vedixwin, herdu jî me dixwin/ Herdu jî zengîn in, herdu jî bengîn in/ Herdu jî bihirs in, herdu jî ditir-sin/ Herdu jî hozan in, herdu jî çozan in/ Herdu jî heval in, herdu jî bi fal in/ Herdu jî bi fend in, herdu jî sazbend in/ Herdu jî bêûrt in, herdu jî bi pûrt in/ Herdu jî dimêjin, herdu jî dihêjin.

Serokkomarî li wan pîroz be, li me rizgarî, azadî doz be/ Li wan tac û text, li me çek û rext/ Li wan bêdadî, li me azadî/ Li wan zîlm û zor, li me keys û dor/ Li wan ew daxwaz, li me ev miraz/ Li wan ew ciya, li me ser ciya/ Li wan ew xebat, li me ev lebat/ Li wan kîf û zewq, li me ezm û şeqw.

Derd û kul û xem, ji bo xalê Cem/ Zîyan û xusran, li Lutfî Dozan/ Doza bêiman, ji bo Erbaqan/ Erdalê dev-qîc, bûye xerc û xîç.

"Bijî Suleyman, siwarê bozê

Dinya bû dûman gur ket nav kozê

"Çoban Silo bû reis- Şilo pilo çavçırıs

Cem û Kamo û Dozan- para wan sîr û soxan."

"Bijî pîvazzurê me – Xocê yobaz gurê me."

"Hop û hop û hop û hop – Melazgir, Patnos û kop.

Bi vê teng û vê qûşê – Hûn tu car naçin Mûşê



Leyla Qasim di 13'ê Gulana 1974'an de ji aliyê rejîma Baas a Iraqê ve hate idamkirin.

## XACEPIRS

**Çeperast:** 1-Stranbêj û huñermendek ji başûrê Kurdistanê, di warê stranê gelêri de hunermendekî navdar e. Di wêne de tê dîtin/ Navê kovareke bi Tirkî ku di warê aborî û politikayê de weşanê dike 2-Karê avdaniyê/ Pozitif 3-Rih, ridên/ Mirad/ Bajar 4-Fêkiyek/ Pasqer-tafe/ Baneşanek, 'ey' 5-Rojek/ Nasan-din 6-Jiyan, giyan/ Şiret 7-Kera më 8-Ard/ Plaqeya Sênegalê 9-Makîneya nivîsandinê 10-Cînavka kesaneyâ yekemîn a yekehejmar/ Cihê ku gundi lê adan û qût difroşin

**Serejêr:** 1-Sarger/ Eşef 2-Eşq/ Amûr, hacet 3-Cejn/ Pronav, zamîr 4-Kirê/ Şiv, şebik 5-Li bakurê rojavayê Kurdistanê navê miletok ku teze dev ji sosyalizmê berdaye/ Berhemek ku ji şîr çedibe 6-Giyayek ji malbata pîvaz/ Zemîn, erd/ Notayek 7-Berhemên Şîrî/ Di qada navneteweyî de, işaretâ alîkarîxwestinê, hewar 8-Tîştekî ku tê kaşkirin û direjki-rin 9-Sembola İridîümê/ Di Misra Qe-dîm de yezdanek 10-Jan 11-Debeng, ehmeq 12-Navçeyeke Diyarbekirê, Dic-le

## Amadekar: Rasto Zilanî



### BERSIVA XACEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ

**Çeperast:** 1-Ehmedê Xanî 2-Merwan/ Pîkap 3-Îr/L/ Ea/ Ode 4-Nêrevan/ Înan 5-Êmo/ Evîndar/ 6-Make 7-Va/ Ciger 8-Dîz/ Rîzî 9-Alîgirî 10-Leven  
**Serejêr:** 1-Emînê Evdal 2-Herêm/ Aile 3-Mr/ Rom/ Zîv 4-Ewle/ Ac/ Ge 5-Darvekirin 6-Ên/ Avegir 7-Enî/ Ezîz 8-Apa/ Nêri 9-Nî/ Îd 10-Îkona 11-Adar 12-O-pen

## LEYLA QASIM

Pêr Besê bû, doh Leyla û iro Binewş, Bêrivan, Miz-gîn û yên din... Jinê Kurd destê xwe yî bi hevîr şûştin û dest avêtin hêviya pêşerojê. Çima ku hevîr tenê jê nan çêdibe! Lê nan tenê têri jinê Kurd na-ke. Ne hevîrê nan, hevîrê Jînê, Jinê Kurd bi xwîna xwe vedistrêni ji axa Kurdistan.... Û li ser wê axê kulikên rengîn kesk... sor.. zer, ne bi stûxwarî bi serbilindî vedibin û bêhna Binewş û Sosinan li çar aliyê welêt, ji dêvla bêhna barûdê ve belav dikin.

Leyla Qasim bû ku digot: "Ez nafetisim, bi hêrs im, Kurd im." Ew bû, şewqa rojê iro û sibehê û du-sibe. Keçen Kurdan da dû şopa wê û qet peymana wê nexistin nava hevîrên girêjî ku di leganê zingarî de bi xwîna Kurdan hatibû vestirandin. Û ji de-haqêن xwedî çekêni kîmyewî û herî giran re nekirin nan, nanênu ku berê jî, jê çêkiribûn di ber wan de dihiştin, da ku Leyla Qasim rehet bikaribe di gora xwe de rakeve.

### Xuskê Can

Leyla Qasim  
Belê! xwişkê can!  
Helal be ji te re, helal!  
Çi xweş e, ci şîrîn e  
Rextên girêdayî  
Li ser bejna te ya delal

Tu jîn î, şîr î-jîr î?  
Keça Kurd î  
Bi şîrê spî û helal!  
Bo serxwebûn û azadiyê  
Di riya felatê de  
Rijiya xwina te ya zelal.

Ew destê gemar  
Ên xwînî yên ku  
Stûyê te yî naîn  
Bi bendar şidandin  
Dijberiya te bû derefşê  
Berhemâ felatiya jinan  
Bû xof ket kezeba wan  
Ew tirsandin

Cangorîbûna egîten wekî te Leyla  
Em bêteqet û xêl hiştin, êşandin  
Lê gelê me, pey tere;  
Gelek Leyla bi tilîliyan  
Bi guleyan, bi stranan şandin.

Adîl Duran

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

### Bedelê abonetiyê razînin:

**Li derive:** Y. Serhat Bucak  
İş Bankası Cağaloğlu Şub.  
Döviz tevdiat Hesap No: 3113617  
**Li Tirkîyê:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

### Navnîşana Welat:

Başmusahip Sok.  
Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul  
Tel (fax): 512 12 87

### Mercen abonetiyê:

	Li hundir	Li derive
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM


# Danasîna çend lîstikan

**1. HOLË:** Ev lîstik di çanda Kurdî de pirr gi-ring e. Lew ku dîrokzan li ser vê lîstikê lêkolînan bikin, dê bibînin cîderka wê ku Mezopotamya ye. Ev lîstik li gelek deran bi navê "Hokey" tê lîzandin.

Du cureyên vê lîstikê hene:

**Cureya yekemîn:** Ji sê kesan heta bi bîst kesan tê lîzandin. Her lîstikvanekî "çemê holê" ji xwe re çedike. Aliyekî çem tûj e. Aliyê din mu-yekî xwar e. Bi aliye xwar li gogê tê dan. "Goga holê" ji dara berûyê, gulover tê çekirin. Mezînahiya gogê wekî kulma (mist) mirov e. Di nîvê meydana lîstikê de kortelek (qonçal) tê kolan. Firehiya wê û kurahiya wê bi qasî beroşekê ye. Navê wê qonçalê holkê ye.

**Destpêkirina Lîstikê:** Lîstikvan radihêje çemê xwe û li pêsiya holkeyê li dû hev dibine rîz. Goga holê bi qederê bîst galvan ji holkeyê dûr datînin. Edî bi dorê, lîstikvan çemê xwe diavêjin gogê: Ji hemûkan çemê kê dûrî gogê bikeve, ew dibe holkvan. Edî bi dorê, lîstikvan çemê xwe diavêjin gogê. Edî holkvan divê ku bi çemê xwe gogê bixe holkê. Lîstikvan nahêlin. Ew jî bi çeman li gogê dixin û ji holkê dûr dikan. Çaxê ku lîstikvan li gogê bixin, divê ku holkvan çemê xwe nehingivîne wan: Ku holkvan çemê xwe bi hingivîne wan ew lîstikvan dibe holkvan. Lê di vir de saxkirin jî heye. Çaxê ku lîstikvan çemê xwe li gogê xist û holkvan çemê xwe hingivan-diye, hê gog nesekinîbe lîstikvanekî din çemê xwe li gogê bixe, ew lîstikvan sax dibe. Yanê



nabe holkvan. Kengî holkvan gog bi çemê xwe kire holkê, lîstik ji nû ve dest pê dike.

**Cureya duyemîn:** Ji çar kesan heta bîst kesan tê lîzandin. Di vê lîstikê de lîstikvan dibine du kom. Divê ku kom bi qandî hev bin.

**Destpêkirina Lîstikê:** Serekvanen komên lîstikê, di nabera xwe de damisto (qure) dikişînin. Komek dibe holkvan û koma din dibe dijberî wan. Holkvan dixwazin ku, gogê ji holkê dûr bixin, lê koma din divê ku gogê têxe holkê. Di nîv saetî de çiqas ku gogê têxine holkê ji wan re baş e, hê bêhtir dixwazin hejmaran zêde bikin.

## 2. BIRRÊ:

Ev lîstik bi du komantê lîzandin. Her komekî bi hindikahî ji çar kesan çêdibe. Divê ku herdu kom weke hev jêhatî û xurt bin. Ev lîstik heta bi cil kesî tê lîzandin.

**Destpêkirina Lîstikê:** Her komekî serekvanekî dibijêre. Herdu serekvan damisto dikişînin. Koma ku damisto deranî dibe "birrêvan" koma din dibe "holkvan".

Kevirekî mezin datînin nîvê meydana lîstikê. Ev kevir "holk" e. Koma birrê li hawîrdorê meydanê belav dibil. Koma holkvanan jî dibine rîz û holkê ji birêvanan dihemînin. Ji aliye din ve jî, dixwazin birêvanan bidin

û wan ji lîstikê bixin. Ku holkvan yeko yeko birrevanen bidin êdî birrevan û holkvan cih diguherin.


Birrevan jî dixwazin ku neyêne dan û an holkê bidin (Lingê xwe li holkê bidin) an jî ji navbera holkê û holkvanan re bi bazdan biborin û holkvanan yeko yeko ji lîstikê bixin. Çiqas birrevan reda holkvanan bibin, hejmaran xwe zêde dikan.

Di vê lîstikê de armanc dana holkê ye.

## 3. CE GENIM (TAYRUMAN)

Ev lîstik ji bo zanîna teyrik û çivîkan (çûkan) geleki cihekî girîng digire.

Di vê lîstikê de çiqas lîstikvan hebin jî dibe.



Di lîstikê dê "gotinvan" heye. Gotinvan desmalê leke mezin dike destê xwe, aliyekî desmalê dike girek. Zarok li dora wî dibine rîz û xwe dike xelqe. Gotinvan desmalê bi destê çepê digirê û bi destê rastê şeklê çivîkekî an jî teyrekî pêş zarokan dike. Wîha dibêje: Mînak, emê bibêjin wê kevokê nişan bide. Dest pê dike: "Tiştekî min heye serê mon hîqlîqîcon, dûvê mon hîqlîqîcon, lîngê mon hîqlîqîcon, perrê mon hîqlîqîcon. Ez goştê wî bixwim û zelqa wî ji we re." Zarok bi dorê radihêjin gireka desmalê bêhn dike û yek dibêje; "Min ji kew". Gotinvan dibêje; "Na". Yek dibêje; "Min ji barbarîkê". Gotinvan dibêje; "Na". Yek dibêje; "Min ji sûskê". He ta ku yek bibêje min ji kevokê, lîstik wîlo dizivire. Çaxê ku yekî nas kir, gotinvan dibêje; "Lêxe." Ew ê ku zane desmalê digire û dide dû zarokan. Digihe kê li wan dixe. Di navê re gotinvan dibêje "Genim e genim e, genim e" Heta ku gotinvan bibêje genim ew dide dû wan. Lê ku gotinvan bibêje "Ce ye" zarok li wî têne hev û digirin. Lîstik ji nû ve dest pê dike. Ku xwe nede dest û were ba gotinvan, destê xwe lê bide lîstik berdewam dike.

Navê hinek çivîk û teyrikan: Dûvsotk, beytik, gobelek, giştonek, titî, barbarîk, devtirk, pe-pûk, silêmanê dunikul, şivanştexlênek, sûsk, bat, tivîlk, hecîreşk, qışık, qirak, bilbil, şalûl, kew, tûtik, başoke, simir, zilorê, qendîl, quling, legleg, tawiz, kund, dar-kutk, cil, tayrêbaz, ke-vok, zerzûl.

Jîr Dilovan

*Hevpeyvîn bi Hunermend Ehmedê Çep re:*

# Xwendina li ser muzîkê pêwist e!

**Folklor di rihê gel de ye û kî stranek folklorî bibêje xelk dê lê guhdarî bike, lê mixabin hinek hene kêmâniyê xwe di paş folklorê de vedişerîn. Divê yê muzîkvan sûdê ji folklor bibîne û muzîkeke nû biafirîne. Lê mixabin niha gelek hene, stranên folklorî werdigerînin stranên nû, gotin û wêjeyan diguherin, bi awayekî ne xwes eda dikan.**

Hunermend Ehmed, bi kurtî jiyana xwe dikarî bi me bidî naskirin...

– Sala 1965'an ez li Kobanê ji dayîk bûm, xwendina min heta lîse (bekelor-ya) li Kobanê bû, emrê min 15 salî bû, min tenbûr bi destê xwe ji xwe re çedi-kin. Kêfa min pirr ji hunermend **Mehmud Ezîz** re dihat û ez besdarî festîwalen wî dibûm, min ji saz û dengê wî pirr hez dîkir.

Sala 82'yan tenbûrek biçük kete destê min û ji wê demê ve ez bi muzîkê ve hatime girêdan. Di sala 84'an de, êdi min xwes li bizqê dixist, bi alîkariya hevalekî (Ebdurrehîm) ez hêdî hêdî hînî lêdana bizqê bûm, piş re min riya xwe dît. Di 86'an de min çend awaz ji xorhekî re amade kirin. Ew distrî û min li bizqê dixist.

Weke em zanin tu xwestî di muzîkê de, ango te xwe bi xwe ava kiriye, ev yek bes e? Yan ji xwendineke akademîk pêwist e ji muzîkvan re?! Hunermend Aramê Tigran di hevpeyvîneke xwe de bi kovara Nûdem re dibêje: "Di van salêن dawî de muzîka Kurdî fireh bûye, lê mixabin ruhiyeta muzîka Kurdî tê de kêm bûye!" Tu çawa dibînî?!

– Rast e ruhiyeta Kurdî kêm bûye, ji ber ku sazine cudayî sazêن folklorî ketine navê, meqamên biyanî ketine navê meqamê folklorî. Ji yê guhdar re diyar e ku

ruhiyet kêm bûye.

Ev yek me dikişîne pir-seke din, gelo folklor çi temsîl dike û heta kîjan derecveyê em karin sûdê ji folklorê bibînin?!

– Folklor jêdera îlhama min e, ew kanî ye, ew bin-geh e ji muzîka modern re.

Folklor di rihê gel de ye û kî stranek folklorî bibêje xelk dê lê guhdarî bike, lê mixabin hinek hene kêmâniyê xwe di paş folklorê de vedişerîn. Divê yê muzîkvan sûdê ji folklor bibîne û muzîkeke nû biafirîne.

Lê mixabin niha gelek hene, stranên folklorî werdigerînin stranên nû, gotin û wêjeyan diguherin, bi awayekî ne xwes eda dikan.

Di nêrîna te de muzîka Kurdî wê bi ci şêweyî pêş keve?

– Bi kurtî ez bibêjîm: Pêşketin bi sazkirina înstuyê muzîkî û bi rêvekirina li pêş muzîkvanan.

Muzîka Kurdî, di ci rewşê de ye?

– Muzîka Kurdî li Kurdistana Iraq û Iranê pirr pêşve çûye û ji ya vê derê pêşvetir e. Ji aliye awazan û aletên xwe yên renge renge ve û komên muzîkî yên pêşketî û mezin ve weke **Koma Dilşad**. Li van deran em dibînîn gelek hunermend hene stranên **Tehsin Taha** û



**Eyas Yûsîf** dîstrîn ev ji delileke li ser gotina min ku muzîka Kurdî li Kurdistana "Iraq û Iranê" pêşve

çûye.

Te qasetek bi navê (Sazin ji Kobanê) tomar kir, ci tişt di vê qasetê de nû ye?

– Tiştê nû ew e ku, cara yekemîn e ez bi bizqê hînek awaz derdixim, hin kesî wisa nekiriye. Ji ber ku tê nasîn bizq hew ji bo stran û meqaman e. Min bi xwe îsbat kir ku bizq ne kêmî keman û piyano ye.

Ez bi xwe dibînim, îmkanatên bizqê ji aliyê deng ve pirr qels e, du oktav (sillem) tenê tê de hene. Lê keman bêhtirî sê oktavan tê hene.. Piyano heft oktav in, ji ber vê min dît ez bi bizqê pirr nikarim ya



kir. Bizqê normal li elameta 'Sol' disekevin, bizqa min li elameta 'La' disekevine.

Niha ci li ber te heye û ji pêşerojê tu ci hêvî dîkî?

– Piştî qaseta min (Sazin ji Kobanê), min sê qaseten din tomar kirin, yek ji wan taybet ji bo govend û dilan bû, qaseta din awazên min in. Qaseta sisivan, Sazîn Kurdî renge reng in. Ez pirr bi hêvî me di bizqê de bixebeitim ku wê bikim aleteke cîhanî û têkeve nav rêza keman, gitar, piyano û hwd.

Gotina te ya dawî ji rojnameya Welat re heye?

– Ez ji rojnameyêre gelikî spas dikim, li ser vê hevpeyvîn û fersenda xwesi û hêvidar im ev rojname tim li pêş be.

**Hevpeyvîn:  
Jana - Jandost**

*Hunermend Ehmedê Çep dixwaze bizqê têxe nav enstrûmanen gerdûni.*

dilê xwe bibêjîm, ez teng dibûm. Min rabû du têl lê zêde kiran, panava (meydانا) deng firehtir bû... Biz-

qa min bû bi sê oktav û nîv îcar ez bi rehetî û serbestî lê didim. Li aliyê din, min destikê bizqa xwe dirêjtir

**Welat**

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ